

**Mafên Zimanî yê Kêmarên ji
Alîyê Ziman ve**

**Rehberek Pratîk ji bo
Bikaranînê**

Cenevr, 2017

Ev dokumana ku ji alî **Komeleya Berî Her Tîştî Zarok** ve ji inglîzî ber bi kurdî hatiye wegerandin, weke wergerê fermî nayê nîrxandin. Ev dokuman weke nêrînên Neteweyên Yekbûyî ye nayê nîrxandin.

Ji alî raportorê taybet î Neteweyên Yekbûyî ve hatiye amadekirin.

Raportorê taybet î Neteweyên Yekbûyî yê Pîrsgîrêkên Kêmaran
Buroya komîseryaya bilind ya Mafên Mirovan
Neteweyên Yekbûyî, Cenevr
814 Avenue de la Paix 1211 Geneva 10
Swîsre

[http://www.ohchr.org/EN/Issues/Minorities/SRMinorities/Pages/SRM
minorityissuesIndex.aspx](http://www.ohchr.org/EN/Issues/Minorities/SRMinorities/Pages/SRM
minorityissuesIndex.aspx) E-posta: minorityissues@ohchr.org

Fotograf: Shutterstock



Ev weşan di çarçoveya "Bernameya YE Etkiniz" de, bi piştevaniya Yekîtiya Ewropayê de hatiye wergerandin. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berî Her Tîştî berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

Tabloya Naverokan

Armanç û Bergeh	4
Beşa I	6
Mafên Ziman Çi Ne?	6
Beş II	8
Çima pêkanîna mafên ziman girîng e?	8
1. Xwegihaştina perwerdeyê û dûre jî xwegihandina perwerdeya bi kalîte ya zarokên kêmaran bi cih tîne	8
2. Bihêzbûna jinên kêmaran û wekheviyê destek dike	9
3. Dike ku çavkanî çêtir bên bikaranîn	10
4. Xizmetên giştî û pêwendiyên bi pêş ve dibe	11
5. Fêdeya wê di pêkhatina îstîqrarê û rawestandina pevçûnan heye	12
6. Piştgirîyên cudahîyan	13
BEŞ III	14
Di pirsgrêkên ziman de famkirina nêzîkatiyek li ser bingeha mafê mirovan û di jiyanê de bicihanîna wê	14
Rûmet	15
Azadî	15
Veder Nekirin û Wekhevî	16
Nasname	17
Beş IV	19
Pêkanîna mafên zimanî li qadên taybet	19
4.1. Perwerdeya Gelemperî	19
4.2. Perwerdeya Taybet	24
4.3. Xizmetên Îdarî, Xizmetên Tenduristî û Xizmetên Giştî yên Din	26
4.4. Nasname û Zimanên Kêmaran	30
4.5. Di Qadên Darazî de Zimanên Kêmaran	32
4.6. Medya û Zimanên Kêmaran	34
4.7. Di Çalakîyên Taybet de Mafên Zimanî	37
4.8. Bi Awayekî Çalak Tevlêbûna Zimanî ya Kêmaran û Tevlêbûna Jîyana Giştî	38
Pêvek 1	42
Çavkanî û alavên zêdetir: Dîrektîfên zagonî û belgeyên fermî yên têkildar	42
Çavkaniyên din	42

Armanc û Bergeh ¹

Raportora Taybet a pîrsgirêkên kêmaran a Neteweyên Yekbûyî (Pispora Taybet a wê demê) Rita Izsák-Ndiaye, rapora xwe ya (A/HRC/22/49) salane ya bala xwe daye maf û pîrsgirêkên kêmaran di sala 2013'an de pêşkêşî Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî kiriye. Raportora Taybet di rapora xwe de tasewasa xwe ya hebûna zehmetiyên der barê bikaranîna mafên zimanê kêmaran ji bo hemû herêman aniye zimên. Ev zehmetî, bergiriya zarokan a li ber xwe gihandina hînkari û perwerdeya zimanê kêmaran û digel wê jî bisînorkirina bikaranîna zimanê kêmaran di qada giştî û medyayê de dihevine. Raportorê, hişyarî kiriye ku zimanê gelek kêmaran ji ber sedemên wekî serdestiya zimanên netewî û navnetewî û pêvajoyên asîmîlasyonê û ji ber bikarhênerên zimanên kêmaran her diçe hindiktir dibe, di asta cihanî de kêmbûnek berbiçav an jî metirsiya ji holê rabûna wan heye. Raportorê, 9 qadên zehmetiyê aşkere kiriye. Ev;

- (1) Gefên li ser zimanên kêmaran û hindikahiyên zimanî,
- (2) Naskirina zimanên kêmaran û mafê ziman,
- (3) Bikaranîna zimanên kêmaran li qada giştî,
- (4) Di perwerdeyê de zimanên kêmaran,
- (5) Di medyayê de zimanê kêmaran,
- (6) Di qada giştî darazî de zimanê kêmaran,
- (7) Di navan de, di navê cihan de û di qada giştî de li ser lewheyan bikaranîna zimanê kêmaran,
- (8) Beşdariya jiyana aborî û polîtîk,
- (9) Agahdarkirin û xizmet dayina bi zimanê kêmaran.

Armanca vê rêzanê ew e, bi siyasetmedaran û xwediyê maf re bibe alîkar ku der barê bikaranîna pratîk a hindikahiyên zimanî de û der barê ziman de ji her alî ve têbigihîjin. Ev rêber, armanc dike ku rêberiyê ji bo hewildana avakirina hevsengiyê bike, ku berpirsiyariya navbera rêzdariya zimanekî fermî yê dewletekê an jî zimanên fermî yê dewletekê û zimanê hîlbijartî an jî zimanê tê bikaranîn ê hindikahiyên zimanî, bike. Raportora Taybet ji bo Fernand de Varennes ku ked daye vê rêzanê spasiya xwe pêşkêş dike. Her wisa parastina mafên ziman û pêşvebirina wan ji bo parastina gelekên zimanên dinyayê jî dibe alîkar. Rêber van armancan dike:

- Zelalkirina gelek mafên der barê bikaranîn û hîlbijartina ziman a hindikahiyên zimanî;
- Belîkirina berpirsiyariya rayedarên dewletê li hember hindikahiyên zimanî;
- Destekirina başkirina dewamî û pêşvebirina sepan û nêzîkatîyên bi bandor (lêçûna li gor wê jî di nav de) ên der barê van mafên hindikahiyên zimanî û

¹ Raportora Taybet ji bo keda wî spasiya xwe pêşkêşî Fernand de Varennes dike.

- Beşdariya kêmaran a jiyana giştî û têkilkirina wan û di warê bi cih anîna mafên zimên de teşwîq kirina xebatên durust û lihevker.

Beşa I

Mafên Ziman Çi Ne?

"Mafên ziman" û "mafên zimanî"; mafê mirovan e ku bandora wê li ser li ser hîlbijartin û bikaranîna ziman a otorîteya dewletan, kesên û kesayetên dezgeyî (sazî) heye. Mafên ziman bi piranî ji mafên zimanî berfirehtir tê dîtin. Ev rêber, ji bo mafên zimanî yê kêmaran bi bandor were bicihanîn tevdirên divê bîn kirin ji yê herî hindik heta tevdirên zêdetir, van her du têgehan jî bi kar tîne. Ziman di navenda xwezaya mirov û çandê de cih digire û yek ji îfadeyên herî girîng ê nasnameyê ye. Loma mijarên çarçoveya ziman ji bo civakên hindakahiyên zimanî ku hewl didin nasnameya xwe ya çandî biparêzin û di bin şert û mercên marjînkirin, ji xwe nehesibandinê de komên ji hev cihê ne, girîng û bi wate ye. Mafên zimanî; ji bo dezgeyên dewletê zimanên belî bi gelekawayan bi kar binin, an jî midaxaleyî hîlbijartina wan a ziman nebin dikare wekî rêze-berpirsiyarî bîne pênasekirin. Ev berpirsiyarî wekî berpirsiyariyên naskirin û destekirina bikaranîna zimanên gelên niştecih û kêmaran dikare were firehkirin. Mafên zimanî jî di nav de, mafê mirovan, pêkhatinek ji berpirsiyariyên yasayî ye ku piştî xwe dide peymanên mafên mirovan ên navnetewî û standardên ku dê pirsgerêkên ziman û kêmaran çawa bîn çareserkin. Qedexeya cudakariyê ya hiqûqa mafên mirovan a navnetewî, di gelek hikman de cih dide mafê derbirin û azadiyê, mafê jiyana taybet, mafê perwerdeyê û mafê hindakahiyên zimanî ku bi mirovên ji koma we re zimanê xwe bi kar bîne. Her wisa ev maf; ji aliyê pelgeyên rehberî û standardên navnetewî yê wekî Belavoka Mafê Kesên ji Hindikahiyên Zimanî an jî Olî, Nijadî an jî Netewî ya NY ya sala 1992'an, Pivana Sêyemîn a Perwerde û Ziman a UNESCO'yê, her wisa biryarên pêşniyazî yê Foruma Pirsgerêkên Hindikahiyên ku liser Pêkanîna Belavoka Mafên Kesên ji Hindikahiyên Zimanî, an jî Olî, Netewî an jî Nijadî, Şîrovaya Dirûvî ya Sêyemîn a Der Barê Mafên Ziman ê Kesên Ji Hindikahiyên Netewî li ser hişyariya Peymana Çarçoveya Konseya Ewropa, Pêşniyazên Oslo yê der barê Mafên Ziman ê Hindikahiyên Netewî ya Yekîtiya Ewlekarî û Hevkariya Ewropa (YEHE) ve hatiye nixandîn. Tevî hinek cudahiyan jî hemû ji bo rayedarên dewletê berpirsiyariyên xwe yî ziman jî di nav de, yê mafên mirovan bi cih binin, hinek nêzîkatiyên dişubin hev du pênase dikin:

- Rêzgirtina mafên ziman, ku parçeyekî bê wî nabe yê mafê mirovan e;
- Di nav tevahiya civakê de teşwîqkirin û naskirina xweşbîniyê, pirçandî û pirzimanîyê, rêzgirtina beramberî û hev du famkirinê;
- Sepandina polîtîka û mewzûhatên çarçoveya der barê mafên zimanî û bicihanîna wan
 - Ji aliyê rêveberên dewletê ve bi piranî di warê bikaranîn û destekirina zimanên cuda de pîvana hevahengiyê û ji bo aliyên taybet bicihanîna pîvana azadiya ziman û berpirsiyariyên mafê mirovan.
 - Ji bo kesên zimanên kêmaran bi kar tînin mecbûr nemînin xizmetên bi vî cureyî bi taybetî bixwazin, lê dema pêdiviya wan pê çêbû jî bi hêsanî bikaribin xwe bigihîninê; têgeha teklîfa çalak a wekî parçeyekî bê wî nebe ya xizmetên giştî û rêzdariya li hember mafên zimanî û peyda kirina van mafan entegrekirina berpirsiyariyên dewletê.

• Ji bo pirsgirêkên zimanî bîn nirxandin û serastkirin li hember dezgeyên pêkanîn, rêveberî û darazî avakirina mekanîzmayên bikêrhatî yên gilîkirinê. Gelek saziyên navnetewî, ji bo zelalkirina ku ev mafên zimanê dê çawa bîn bicihanîn û dîsa ji bo teşwîqkirina van pîvanan pêvajoyên amûr û rêzîkname ava kirine. Foruma Pirsgirêkên Hindikahiyan a NY'ê, Beşa UNESCO ya Ziman û Pirzimanîyê, Lijneya Şêwirmendî ya Peymana der barê Parastina Hindikahiyan a Konseya Ewropa û Komîseriya Bilind a Hindikahiyan Netewî ya Dezgeya Ewlekarî û Hevkariya Ewropa (DEHE), pêvajoya mafê mirovan dema ku pêkanîna mafê mirovan dibe mijar, agahiya ku dê bihêle amûr û rêzîknameyên wê timî bîn pêşvebirin, ji bo destek û guhartina pîsporan beramberî hev bi berdewamî platforman çêdike. Yek ji taybetiyên girîng ê van pêvajoyên amûr û rêzîknameyan ew e ku otorîteyên dewletê polîtîkayên xwe yên derbarê mafên zimanî de bi awayekî çalak amade bikin, bi cih bînin, binirxînin; her wisa li cihê pêdivî pê hebe ji bo xebatên têkildar û hewildan bîn pêşvebirin pêşkêşkirina daneyên ewle û ji hev hatine cudakirin e. Di van peymanan de, di rêznameyên hindurîn de û di pelgeyên rehberî de mafên zimanî yên bingeîn ku cih digirin bi çar armancên bingeîn kar dikin:

1. Rûmet: Madeya 1. a Daxuyaniya Global a Mafê Mirovan, dide xuyakirin ku hemû mirov ji aliyê azadî, rûmet û mafan ve wekî hev in. Ev, pîvan û zagonek hiqûqa bingeîn a navnetewî ye, bi taybetî dema pêşvebirin û parastina nasnameya kêmaran dibe mijar girîngiya wê pirtir dibe.

2. Azadî: Hilbijartina zimanî ya kesên di warê karên taybet ên ji derveyî qada giştî, azadiya derbirinê, mafê jiyane, mafê kêmaran ê bikaranîna zimanê xwe an jî qedexeya cudaxwaziyê ji aliyê mafê mirovan ê bingeîn ve tê parastin. Çi bazirganî, hunerî, olî an polîtîk be an nebe, her cure xebatên taybet ji aliyê van mafan ve tê parastin.

3. Wekhevî û Nekirina Cudaxwaziyê: Qedexekirina cudaxwaziyê; dewletan di warê xebat, xizmet û îmtiyazên wan ê tê pêşkêşkirin de asteng dike ku nikaribin hemwelatîyan ji ber vebijêrka ziman bi sedemên ne maqûl têxe rewşa dez-avantaj û wan dûr bixe.

4. Nasname: Formên zimanî yên Nasnameyê; kes, ji bo piraniya civak an jî dewletan bingeîn tê dîtin. Ev jî; bi mafê azadiya derbirinê, mafê jiyana taybet, mafê kêmaran ê bikaranîna zimanê xwe an jî qedexeya cudaxwaziyê ve tê parastin. Pirsgirêkên mafên zimanî: (i) Rayedarên dewletê û vebijêrkên zimanî di her rewşê de divê li ber çavan be. (ii) Bi mijarên wekî netewî, hevkarî û nasnameya şexsî re pêwendîdar e. (iii) Bandorek wê li ser beşdarkirin û daxilkirina kêmaran heye. (iv) Ku bi hevsengî, maqûl û rast neyê girtin, dikare bibe sedema dilnîyên biyanîbûn an jî yên dîtir û wekî potansiyela bê îstîqrariyê an jî pevçûnê û (v) gelek rewşên cuda û şert derkevin holê. Di warê pêkanîna mafên zimanî de pîvanek ku hemû tayên netewî yên cihanê wekhev bike, “li her kesî bike” tune ye. Ev rêber, aliyê xweser ê mafên zimanî dinirxîne. Rêber, çarçoveyekê pêşkêş dike ku di mijara pirsgirêkên ziman de li ser çavlêbûna rûmet, azadî, wekhevî û nasnameyê dewlet mafên mirovan li gor berpirsiyariyên xwe yên navnetewî bi cih bîne.

Beş II

Çima pêkanîna mafên ziman girîng e?

Girîngiya mafên ziman aşkere ye: Bikaranîna kêmaran a zimanê xwe, digel berpirsiyariya rêzdariya mafê mirovan, encamên wê yên girîng ên wekî berfirehiya civakî û beşdariya civakî heye.

1. Xwegihaştina perwerdeyê û dûre jî xwegihandina perwerdeya bi kalîte ya zarokên kêmaran bi cih tîne.

Xwegihandina perwerdeya fermî ya zarokên kêmaran li çarhawirdora cîhanê an pir kêma, an jî ev zarok qet perwerdeyê nabînin. Li gor daneyên Bankaya Cîhanê: “Li cîhanê nivê zarokên ku naçin dibistanê, ji wan civakan e ku zimanê dibistanê li malê nayê bikaranîn, ku tê bikaranîn jî pir kêma tê bikaranîn. Ev rewş têgeha “Ji bo her kesî perwerde” di warê bicihanînê de bi zehmetiya herî mezin re rûbirû dihêle: Asta nizm a hindekariyê, di polên bilind de dest jê berdana dibistanê an jî dubarekirina polê dibin encamên ku wekî mîrate dibînin.”²

Dema zimanê zikmakî 6-8 salan wekî zimanê perwerdeyê tê bikaranîn encam bi bandor e. Ev encam; ji xwe baweriyek pêşketî û ji xwe razîbûnê, beşdariya dersê ya zarokên kêmaran,³ di terikandina dibistanê de hindikbûn, di warê akademîk de serkeftinên bilind,⁴ jiyaneke dirêj a perwerdeyê, encamdanek bilind a azmûnan, di nav zarokên hindikahî (û gelê niştecih) de hem di zimanê xwe yê zikmadî de hem di zimanê fermî de û/an jî di zimanê serdest de bikaranînek hîn herikbar û edebî ye.⁵


² Bankaya Cîhanê, Bi Zimanê Xwe, Ji Bo Her Kesî Perwerde, (Bankaya Cîhanê: Washington, 2005).

³ Alidou, H. et al. Li Efrîkayê Pêşvebirina Hînedekarî û Perwerdeyê: Ferqa Ziman, Xebata Alavan di Mijara Perwerdeya Bi Zimanê Zikmakî û Pirzimanî de li Efrîkaya Binya Sehayê, Perwerdeya Pêşvebirina Perwerdeyê li Efrîkayê (Perwerdeya Elman a Hevkariya Teknîk: Parîs, 2006).

⁴ UNESCO, Hîndekariya Li Ser Bingeha Zimanê Zikmakî û Pêşvebirina Kalîteya Xwendin û Nivîsandinê: Xebatên Mînak ji Asya, Efrîka û Başûra Emerîkayê (UNESCO: Bangkok, 2008).

⁵ UNESCO, EFA (Education For All: Ji Bo Her Kesî Perwerde) Rapora Çavdêriya Gerdûnî 2014: Hînkirin û Hînbûn (UNESCO: Paris, 2014).

((Di navbera zarokên li Maliyê bi zimanê xwe perwerdeyê dibînin (nîşankirina şîn) û tenê yê bi zimanê fermî (Frensi) perwerdeyê dibînin de %32 ferq hatiye dîtin. Grafik 1: Di encama azmûna Dibistana Seretayî de asta serkeftinê, 1994-2000 1994 1995 1996 1997 1998 1999 2000 Çavkanî: Bankeya Cihanê, Bi Zimanê Xwe: Ji Bo Her Kesî Perwerde (Bankeya Cihanê: Washington, DC, 2005).)))



Çavkanî: Bankeya Cihanê, Bi zimanê xwe: Ji bo her kesî perwerde (Bankeya Cihanê: Washington, DC, 2005).

2. Bihêzbûna jinên kêmaran û wekheviyê destek dike

Jinên kêmaran, li dinyayê nav kesayetiyên herî pir hatine derîkirin de ne. Her wisa fersenda xwegihandina wan a dibistanê an jî hînbûna zimanê giştî/fermî ji ber cudakariya civakê ya zayendî û/an jî nijadî hîn kêmtir e. Lêkolîn nîşan didin ku jin dema bi taybetî bi zimanê xwe perwerde dibin hîn pirtir serkeftî ne. Bi vî rengî asta jinan a ku xebatên dişubin hev pêşvetir bibin pirtir dibe an jî gerîneka wan a xizanî û îzolasyonê dişikê. Dema mijar dibe tenduristî û tiştên girîng ên jiyanê pêwendîya jinên kêmaran bi mirovên din re dema zimanê xwe bi kar tînin pirtirdibe. Gelek hewildanan nîşan daye dema zimanê kêmaran hatiye bikaranîn di warê xwe gihandina jinan de û beşdariya jinan û bihêzbûna wan de girîngiya wê nîşan daye.

Vietnam

“Pîrik û nexweş dema heman zimanî bikar tînin encam baştir dibe”

Li gor lêkolînan: kesên ku perwerdeya pîrikayî hildane dema welidînê da ku li gel nexweş bibin ev dibe destkariya herî girîng. Li Vietnamê her roj di navbera pênc û heftan de jin ji ber astengiyên welidîn an jî hemlebûnê jiyana xwe dest didin. Rêjeya mirinê ya herî zêde jî di nav komên etnik, kêmar û çiyayî de pêk tê ku herî kêrîmkanê pîrik û xebatkarên pîzîşkîyê li wan deran hene. Her weha li van deran astengiyên çandî jî bûne pîrsgirêk ku jin li ser tenduristiya zêdebûnê sud wergerin.

Ji bo holê rakirina vê pîrsgirêkê hikumet û hevkarên pêşketinê yê navnetewî, di wan gundan de perwerdeya pîrikayî ji bo wan jinan dide dest pê kirin. Hebûna van pîrikan; dibe sedem ku zimanê nexweşan, çanda wan, pergala baweriyên wan bê fam kirin û ji bo dest xistina bawerîya nexweşan an jî zêdekirina wêrekîya nexweşan ku xwe bigihînin xizmetên pîzîşkîyê roleke mezin dileyîzin.

Ji jinên perwerdeya pîrikayî hildaye Te: *“ji ber gelek sedeman bawerîya xwe bi min tînin: li vî gundê jî ayîk bûm û li vî gundê mezin bûm. Ji ber vê min nas dikin... û em jî heman neteweyê ne, heman zimanî diaxîfin”* dibêje. Ev bawerî dibe sedem ku Te xizmetên tenduristîye cur bi cur peşkeş bike û piştgirî dide ku azîneyên bere ku bûne sedema derengmayîna tenduristiya dayîkan (welidînên daristanan jî di nav de) .

Çavkanî: UNESCO, *ji bo mebestên pêşveçûnê ya hezarsalî ziman çima girîng e* (Banglok: UNESCO, 2012). r. 29.

3. Dike ku çavkanî çêtir bên bikaranîn

Bikaranîna zimanê kêmaran di perwerdeya giştî û qadên din de jî, ji alî finansê ve hîn bi adan e û lêçûna wê li gor wê ye. Perwerdeya bi zimanê fermî, li gor perwerdeya zimanê fermî di salekê de nêzîkî %8 lêçûna wê hindiktir e. Lê lêçûna giştî xwendekarekî şeş (6) salên dibistana seretayî ji ber ku bi piranî pola xwe dubare dikin an jî dibistanê diterikînin derdikeve %27'an.⁶ Her wisa bikaranîna hemû pere û çavkaniyan di weşana qada giştî de an jî pêkanîna kampanyayên agahdarkirina raya giştî bi zimanekî ku ji aliyê hemû civakê ve nayê famkirin ne

⁶ Bankeya Cîhanê (Nîşe 2).

encamek bi bandor çêdike, ne jî lêçûna wê hindiktir e. Di rewşên wiha de bikaranîna zimanê kêmaran ji bo gihaştina tevahiya civakê bikaranîna herî rast a çavkaniyan e.

4. Xizmetên giştî û pêwendîyan bi pêş ve dibe

Bikaranîna zimanekî kêmaran wekî zimanê têkiliyan di pêşkêşîya xizmetan de; di warê çêtirkirina kalîteya xizmetên tenduristiyê, xizmetên civakî, perwerde, şewirmendiyên kardayiniyê, darazî û xizmetên din ên giştî de û di xwe gihandina van xizmetan de encamên çêtir û bibandortir tîne. Ji ber ku pêwendî pêvajoyek dualî ye û rayedar divê timî hewl nedin ku yekzimaniyê (zimanê fermî) arasteyî her kesî bikin. Divê rayedar bikaribin xwe bigihînin kêmaran ango civakên zimanên din bi kar tînin. Dema bi kêmaran re têkilî tê danîn ku zimanê wan nayê bikaranîn dilîniyên wekî wan ji xwe nabînin mezintir dibin, lê dema zimanê wan tê bikaranîn dibe sedema xwe rasterast bigihînin wan û beşdariya wan a civakê çêtir pêk were. Li aliyê din jiyanan rizgar dike, ji ber ku ziman astengiyek mezin e di pêşîya xwe gihandina xizmetên tenduristiyê de.

Moxolîstan

“Lêhûrbûna li ser zimanên kêmaran piştgirî dide ewletîya însanan”

Moxolîstan di pêşketineke zûtir de be jî komên etno-zimanî rewşa xwe ya dejavantajî berdewam dikin. Hikumeta Moxolîstanê UNESCO, DSO, UNDP, UNICEF jî di tê de Neteweyên Yekbûyî vê rewşêpejirandin û ji bo parastina van komên bêpişt û etno-zimanî projeyên domdar dane destpêkirin.

Girîngîya zimanên niştecih, perwerdeya kêmaran, agahiyên tenduristiyê û perwerdeya pêwistîyan ji bo ku bastir be piştî xwe dide temabûna bîngêhîna ziman. Divê ji bo ku her kes bikaribe bigihîje agahiyên derbarê aborî, perwerde, tenduristî û tiştên din piştgirî di zimanên her komî de bi alîkarîya radyo û televîzyonan bê dayîn. Zimanên kêmaran her ku diçe zêdetir tê pejirandin û di perwerdeya zarokan, perwerdeya giştî û perwerdeyên pêwistîyan de; di derfetên kar de divê piştgirîya van zimanan bê dayîn. Proje bi taybetî armanc dike ku politikayên heyî bi pêşerojê ve û bi APS (Armancên Pêşketinê ya Sedsalî) ve – bi taybet 7. APS ve ku bibe pratîk û bê bikar anîn- bihêztir bike. Her weha hêvîdareyek din jî ev e ku proje li agahiyan ji zimanên niştecih ji bo siyasetmedaran kom bike.

Çavkanî: UNESCO, ji Aliyê Armancên Pêşketinê ya Hezarsalî vê Girîngîya Ziman (Bangkok: UNESCO, 2012), R. 41.

5. Fêdeya wê di pêkhatina îstîqrarê û rawestandina pevçûnan heye

Li cihên ku mafên zimanî tê bicihanîn dema sedema xwe biyanî dîtin, xwe ewêdî dîtin û li derve hiştinê tên belîkirin, jê dûrketina pevçûn û rakîşandinên nijadî yên hindur dewletê pirtir mimkûn e, ji ber ku dema zimanê kêmaran tê bikaranîn asta beşdariya kêmaran û digel wê jî hebûna wan a di hindur dewletê de û xwe dîtina wan û heta kar dîtina wan pirtir digihîje encamê. Ev jî ji bo yekîti û îstîqrarê alîkarî ye.

Berî pevçûnek derkeve, ku mafê kêmaran di makezagonê de hebe û di hilbijartin, dad û perwerdeyê de hatibe bicihanîn, dibe ew pevçûn qet dernekeve.

Çavkanî: Baldwin, C., Chapman, C. and Gray, Z., Mafên Kêmaran: Mifteya Pêşlêgirtina Pevçûnê (Mafên Kêmaran ê Navnetewî: Londra, 2007), s.2.

Li gel vê jî bo bikaranîna zimanê fermî ya ji aliyê kêmaran ve li hin cihan dibe sedema cudabûnê û îhtimala şidetê jî zêdetir dibe. OSCE jî Şêwrên xwe yên di Derbarê Parastina Mafên Zimanî yên Kêmaran de ji ber vê firehtir kiriye.

6. Piştgirîyên cudahîyan

Jidestdana cureyên zimanî jidestdana zimanê kêmaran mirata mirovahîyê ye. Dewlet divê tenê piştgirîya zimanê netewî yan jî çend zimanan neke, her weha rêzê ji bo hêmanên nasnameyan jî bigire. Divê van zimanan bigihîne cihên têkildar, piştgirî bide berdewamiya wan.

Ziman alava tevlêbûnê ye. Ziman di navenda çalakîyan, îfadeya kesên û nasnameyan de xwe dide nîşan. Naskirina girîngîya ziman, encamên mayînde ji bo tevlêbûna piştrastkirinê dide...

(Çavkanî: UNESCO, ji bo mebestên pêşveçûnê ya hezarsalî ziman çima girîng e (Bangkok: UNESCO, 2012))

BEŞ III

Di pirsigirêkên ziman de famkirina nêzîkatiyek li ser bingeha mafê mirovan û di jiyanê de bicihanîna wê

Nêzîkatiya pirsigirêkên ziman a di çarçoveya mafê mirovan de, ji aliyê ku otorîteyên dewletê berpirsiyarên xwe bi awayekî baştir bi cîh bînin, dikare wekî metodek "naskirin-bicihanîn-pêşvebirin" were çarçovekirin. Qanûn, polîtîka û pêvajoyên mafên ziman di çarçoveya mafê mirovan de nas bike, otorîte jî divê van bi kirin û çalakiyên xwe re bikin yek. Digel vê jî ji bo qadên bi pirsigirêk bi awayekî çalak bînin nîrxandin û di navbera wan de lihevkerin çêbibe divê mekanîzma çêbibin. Nêzîkatiya mafê ziman a di çarçoveya mafê mirovan de ji ber van sedeman girîng e:

- Fêdeya wê heye ku mafê mirovan di asta navnetewî, netewî û herêmî de were parastin û pêşvebirin, her wisa li ser avahiya amûr û mekanîzmayên heyî ku şopandin û sepanê dîkin. Ku mafê zimanî wekî tiştekî îstîsnaî, taybet û awarte were nîşandan dikare bibe sedema şaş famkirinan, li hem ber derketinan û red kirinan. Ku cihê mafê zimanî di nava mafê mirovan de were zanîn û ev were gotin, ji bo di çarçoveya hiqûqa mafê mirovan a navnetewî û rêzîknameya hindurîn de bersiv li pirsigirêkên ziman bînin dayîn pirtir derfetan dide.
- Nêzîkatiyek wiha, perspektîfa alîkariyê dide ku cur bi cur polîtîkayên ziman bînin pêşvebirin û bînin beralîkirin. Di nav dewletên cuda de, ji bo sepanên baş ên di nav wan dewletan de bînin dubarekirin dikare tecrûbe û zanîn were parvekirin. Bi vî rengî alîkariyê dike ku hiqûqa navnetewî û standardên wekî şert hatine pêşkêşkirin veguhezin mewzûhata pratîk, polîtîka û pêvajoyê
- Ev nêzîkatî, alîkariyê dide ku polîtîkayên dewletekê ku dibin sedem qismekî girîng e nîfûsê marjînal bimîne, li der hiştin û heta pevbiçînin û ji alî standardên navnetewî ve kêmkirina bînin belîkirin û/yan jî daxê asta herî hindik. Nêzîkatiya mafê mirovan a ku di warê pirsigirêkên ziman de bi pergal û rêkûpêk tê bicihanîn, çawa ku di warê belîkirina pirsigirêkên potansiyel û bandora wan a nebaş de dibe alîkar, her wisa jî bo bersivandina wan û serastkirinê jî rîyan û amûran pêşkêş dike.
- Di pirsigirêkên ziman de ji bo nêzîkatiya li ser bingeha mafê mirovan 4 qadên bingeîn hene. Ev;

Rûmet

Xala 1. a Daxuyaniya Gerdûnî ya Mafê Mirovan, radigihîne ku hemû mirov ji aliyê rûmet û mafan ve wekî hev û azad in. Ev daxuyanî, pîvaneke sereke ya bingeîn a hiqûqa navnetewî ye. Di daxuyaniya NY ya Ragihandina Kêmaran de tê gotin ku rêveberiyek baş ew e, ku di mijarên rûmet û mafan de ji her kesî re li ser bingeha wekhevî û aşîxwaziyê û çêker destûrê dide serastkirinan û nasnameya komên cuda diparêze û ji bo pêşvebirina wan destûrê dide pirjimariyê, ji bo vê jî guhartinên yasayî, îdarî û herêmî pêk tîne. Bicihanîna daxwazên kêmaran û pêkanîna mafên wan rûmet û wekheviya hemû mirovan qebûl dike, pêşketina beşdariyê teşwîq dike, di hindur dewletan de û di nav dewletan de ji fêdeyê dide xwe li hev rakişandinê kêm bibin.⁷

Azadî

Yek ji qadên herî girîng a mafê mirovan, ji bo di mijarên taybet de azadiya ziman garantî bike xebat/qadên taybet ên hiqûqa mafê mirovan a navnetewî cih didê, vedihewîne. Ev, çalakiyên li ser bingeha bazirganî û zanînê,⁸ civaka sivil û şirketên taybet,⁹ bi zimanê kêmarekê şano pêşkêşkirin, çalakiyên beşdariya polîtîk ên taybet, weşanên taybet û heta awayê navê kesekî yê bi zimanê wan¹⁰ dihundirîne. Tevî xebatên weşangeriyê û perwerdeya taybet, di hemû çalakiyên taybet de zimanê tê bikaranîn, di qada mafê zimanî de cih digire. Heke mirov bi giştî bêje; ne ji bo parastina pergala giştî û tenduristiya giştî be, ku ew jî îstîsna ye û sînore wê jî divê hebe û ji bo van jî divê hincetên wê hatibin nîşandan, wekî din mafê vebijêrka bikaranîna ziman a kesan nikare were sînorkirin.

Komên kêmarên zimanî, divê ji tehdîd û êşên li ser nasnameya xwe dûr bên hiştin. Ji bo vê jî otorîte, qada civakî jî di nav de, divê li dijî her cure tawanên xweşnebinîyê û nefretê wan biparêzin.

Mercên cuda dikarin rêzemaşên mirovan ên cuda derxin holê. Mînak, azadiya bikaranîna zimanê olî yê pêwendiyê di azadiya pirsgrêkên olî de dikare bibe alîkar. Bi

⁷ Commentary of the Working Group on Minorities to the United Nations Declaration on the Rights of Persons Belonging to National or Ethnic, Religious or Linguistic Minorities, <<https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G05/133/85/PDF/G0513385.pdf?OpenElement>>.

⁸ Ballantyne, Davidson, McIntyre v. Kanada, Komîteya Mafên Mirovan, CCPR/C/47/D/359/1989 ve 385/1989/Rev.1, 31 Adar 1993.

⁹ Ouranio Toxo ve Diğêrleri v. Greece, Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropa, 74989/01, 20 Cotmeh 2005.

¹⁰ Raihman v. Latvia Komîteya Mafên Mirovan ya NY, CCPR/C/100/D/1621/2007, 28 Cotmeh 2010.

giştî, naskirina zadiya ziman wekî mafekî bingeînê ê hiqûqa navnetewî, pala xwe dîsa dide berpirsiyariyên jêrîn ku di peymanên mafên mirovan ên navnetewî de cih digirin:

- Azadiya derbirînê, komele û ol;
- Mafê jiyana taybet;
- Mafê kesan, bi kesên din ên ji civaka kêmar re mafê bikaranîna zimanê xwe;
- Qedexkirina cudaxwaziyê

Mafê wehkeviyê ku bê cudahî tê bicihanîn, bi qadên taybet ne sînorkirî ye û her wisa dikare heta qadên polîtîkayên ziman û veguhartinên wê vebijêrkên ziman dixê bin bandora xwe jî were berfirehkirin.

Zimanê ku tê bikaranîn jî di tê de li cihên taybetiyên civakan ber çav digrîn ji aliyên azadiya şexsî, azadî, berfirehî û demokratîk in. Tevahîya çalakîyên taybet wek; perwerdehî, jiyana malbatî, navên kesan, weşanên taybet û elektronîk, stran û çalakîyên çandî, ayînen dînî, bazirganî û çalakîyên polîtîk û hwd tabîê azadiya bikaranîna ziman e.

Veder Nekirin û Wekhevî

Tevahîya mirovan li hemberî cudakirina mafên zimanê xwe xwedîyê mafên parastinê ya hevpar in. Dema helwest kesan belasebep dixê rewşa dezavantajî, bibe sedema li ser pêkhatina zimanê xwe vederkirina van kesan, wê deme dibe cudakirinên ku hatine qedexeyê kirin. Ev rewş di şert û mercên zimanê fermî de,¹¹ an jî rewşên di navbera zimanekî fermî û zimanekî kêmaran de jî¹² li ser cudahîya bikaranînan derbasdar e.

Rêvebir; ji bo xizmetên giştî ku tên peşkeş kirin¹³ gihîştina têgeha edaletê,¹⁴ rêk û pêk kirinên bankayan,¹⁵ perwerdehiyên giştî¹⁶ heta mafê bi destxistina hemwelatîyê¹⁷ jî di nav de çalakîyên dewletê yan jî xizmetên dewletê divê ji aliyê zimanî de wekhev be û li gor qedexeyên cudahiyan divê bê bikar anîn. Qedexkirina cudahiye, di peymannameyên Navnetewî yên Derbarê Mafên Aborî, Civakî û Çandî û peymannameya Navnetewî Derbarê ji Holê Rakirina Cudahiyên Netewî yên bi her Awayî cih digire. Ji xeynê vê hêmanên ziman û perwerdehiyê bi YN ve li Danezana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de ne, van diyar dikin:

¹¹ Kevin Mgwanga Gunme et al. v. Cameroon, Komîsyona Mafên Mirov û Gelan ya Efrîk, Rahigîn 266/2003, 27 Gîlan 2009.

¹² J.G.A. Diergaardt et al. v. Namibia, Komîteya Mafên Mirovan ya NY, CCPR/C/69/D/760/1997, 25 Tîrmeh 2000.

¹³ J.G.A. Diergaardt et al. v. Namibia (not 12).

¹⁴ Bickel and Franz v. Îtalî, Dadgeha Ewropa C-275/96, 24 Sermawez 1998.

¹⁵ Mgwanga Gunme et al. v. Cameroon (not 11).

¹⁶ Case relating to certain aspects of the laws on the use of languages in education in Belgium v Belgium, European Court of Human Rights, 1474/62, 1677/62, 1691/62, 1769/63, 1994/63, 2126/64, 23 July 1968 (no.2).

¹⁷ Mgwanga Gunme et al. v. Cameroon (not 11).

Bikaranînên ku maqûl û tiştên înisîyatîf tê de nebe, tişta herî baş divê ji bo ev ziman derbasî jiyane bin, ji aliyê dewletan ve bi awayekî hurgilî were nas kirin, li ser hevparîya wî bê sekinin, li mevzuatê û di polîtîkayan de li gor hêmana rêjeyê bê taqîb kirin û bi cîh kirin.

Mijarên dezavantajî, vederkirin û mijarên ku maqûl nîn in, ji aliyê rêjeyê ve bingeha bikaranîna zimanên kêmaran û çalakîyan ava dike. Bikaranîna zimanên kêmaran ji aliyê xebatkar û xizmetên giştî ragihandinek û danûstandina agahîyan baştir pêk tîne. Zimanên kêmaran ku bi rêjeya nifûsê re bê bikar anîn hem ji aliyê aborî hem jî ji aliyê kardîtinê ve derfetên zêdetir derdixe holê. Ji bilî vê, di bikaranînên xizmetên tendurîstîyê de jî derfetên firehtir û ewletir dide pêşîya kesan. Bi alavên ragihandinê ve zanînnên rasttir bi zimanê xwe bidest dixin. Di perwerdeya giştî de ku zimanê kêmaran bî bikar anîn encam bibandortir dibin. Bankaya dunyayê,¹⁸ UNESCO,¹⁹ UNICEF,²⁰ xebatên ku li dunyayê û li deverên din tên kirin²¹ dide nîşan ku perwerdeyên bi zimanê netewî ve zimanê kêmaran jî hatibe bikaranîn, li gor perwerdeyên yek zimanî yan jî netewî zêdetir encamên erênî daye:

1. Di domdirêjîyê de buhayê wê kêmtir e.
2. Rêjeya devjêberdana dibistan û dubarekirina polan hindiktir dibe.²²
3. Bi taybetî ji bo zarokên keçik di qadên akademîyê de encamên erênî derketina holê.²³
4. Rêjeya xwendin û nivîsandina zimanê zikmakî hem di zimanê netewî hem jî di zimanê kêmaran de zêdetir dibe.²⁴
5. Tevlêbûna malbat û civakî zêdetir dike.
6. Bikaranîna zimanê kêmaran ji aliyê giştî û rêvebirîyê ve bingeha têgehên wek tevahîkirinê, têgihîştinê, qalîteyê û bibandorîyê ava dike.

Nasname

¹⁸ Dutcher, N. and Tucker, G. R., *The Use of First and Second Languages in Education: A Review of Educational Experience* (World Bank: Washington DC, 1997); World Bank (note 2).

¹⁹ Lopez, L.E., *Reaching the unreached: indigenous intercultural bilingual education in Latin America*, paper commissioned for the Education for All Global Monitoring Report 2010, Reaching the marginalized (UNESCO, 2010).

²⁰ UNICEF, 'Action Research on Mother Tongue-based Bilingual Education: Improving the equity and quality of education for ethnic minority children in Viet Nam', September 2012, available at <http://www.unicef.org/vietnam/Edu_Pro_Brief_3_-_8_pages.pdf>.

²¹ UNESCO (note 4); Kosonen, K. and Person, K.R. 'Languages, identities and education in Thailand', in Peter Sercombe and Ruanni Tupas (eds), *Language, Identities and Education in Asia* (Palgrave Macmillan, 2014); Baron, K., 'ACLU sues state over English-language instruction', EdSource, 24 April 2013, <http://edsources.org/today/2013/aclu-sues-state-over-english-language-instruction/30901#.UvsFZ_t_LSe>.

²² Association for the Development of Education in Africa, 'Language and education', *ADEA Newsletter* (April–June 2005), p. 13.

²³ Benson, C., *Girls, Educational Equity and Mother Tongue-based Teaching* (UNESCO: Bangkok, 2005), <<http://www.unescobkk.org/resources/e-library/publications/article/girls-educational-equity-and-mother-tongue-based-teaching/>>.

²⁴ Cummins, J. (2000), *Language, Power and Pedagogy: Bilingual Children in the Crossfire* (Multilingual Matters: Clevedon, UK, 2000).

Di civakên hemûgir de hem nasnameya netewî hem jî nasnameya kesayetî girîng e, yek yeke veder nake. Ev hemûgirî wek navenda nasnameya kêmaran dirêjî navenda zimanê kêmaran dibe. Ji xeynî ku navên van kesan bi zimanê wan bîr qebûl kirin jî divê ji alîyê rêvebiran ve bîr bikar anîn jî.²⁵ Di pîrsgirêkên zimanî de tiştên cudaker tunebin dê nêzîkahîyek di navbera kêmaran de çêbibe û cihên ku kêmar li wir zêdetir dijîn navên kuçe û kolanani tabelayên topografîk bi zimanê wan bin, bîr awayê ragihandin û lihevkerin jî hêsantir dibe. Naskirina nasname û zimanên netewî armanceke perspektîfa mafên mirovan e. Navendîbûna nasnameyan ji alîyê YN ve bi madeya 1em û Danezana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de hatîye vegotin. Rêzgirtina zimanê kêmaran helbet ji bo parastina nasnameyê xalekê girîng e lê pîrsgirêka “navan” bi rûmet û nasnameyê ve zêdetir têkildar e. Navên kesan ji ber ku bi navên civak, herêm, çand, kevneşopî û dîrokê re têkildar e, têkilîyeke hestî û girîngtir e.

²⁵ 25 Raihman v. Latvia (not 10)

Beş IV

Pêkanîna mafên zimanî li qadên taybet

Ev beş ji bo zimanên kêmaran bi mafên mirovahiyê ve di qadên navnetewî de avakirina standartan, saz kirina zagonên têkildar û çêkirina wan ên bi bandor, pejirandina polîtîkayên bi vî awayî û di nav koman de entegrasyona komên zimanên kêmaran ku bikar tînin parastin e. Her weha armanc dike ku van berjewendiyên sîyasîmedarên ku van xalan hesab dike biparêze û piştgirîya wan bike. Di vê beşê de bi kurtasî cih dane ziman ku ew di her qadî de bê bika anîn.

Bikaranînan mafên zimanî di beşên bê de;

- Divê çi bê kirin
- Ji bo çi bê kirin
- Bi piştgiriya kîjan zagonan divê xwe gire bide û bingeha xwe ji kîjan zagonan hilde
- Mînakên baş

Bi vê awayê hatiye par ve kirin.

4.1. perwerdeya gelemperî

Divê çi bê kirin?

Ku daxwaz di asteke baş de be, xizmeta perwerdehiya bi zimanê kêmaran di pîvaneke fireh de tê ciheke guncav. Ev helwest din av xwe de ji pêşdibistanê heta zanîngehan ji bo her astî derbasdar e. Heger axivêrên zimanên kêmaran van faktoran bikar neynin divê dewlet bi qasî hêza xwe piştgirî bide ku zimanên kêmaran bibe zimanê perwerdehiyê. Her weha divê zarok xwediyê mafên hînbûna zimanê fermî û zimanên din be jî.


Divê çima bê kirin?

Mafên kêmareyên zimanî û bikaranîna van zimanan di asteke baş de jî di nav de divê rêza mafên mirovahî jê re bê girtin. Perwerde, li ser mafên zimanên kêmareyan disekine û di heman demî de bingeha berdewamîya van zimanên cuda diparêze. Zimanekî ku neyê hîn kirin bibe nebe yê wenda bibe.

Li cihên dunyayê yên cur bi cur lêkolînên zanistî ku li ser zarokên kêmaran hatine kirin jî sûda perwerdeya bi zimanê zikmakî bi awayekî vekirî nîşan daye.²⁶

²⁶ UNESCO (note 4); Kosonen ve Person (note 21); Lopez, L. E. (note 19); Dutcher ve Tucker, G.R. (note 18).

Şekl: Başurê Afriqayê ku li cihên cuda serkeftina zarokên pola 6an, li cihekî zimanê perwerdeyê û zimanê zikmakî wek hev e li cihekî ji hev du cuda ne.



Çavkanî: Pola 6an rapora nixandina netewî: daireya perwerdeyê, 2005

Nîşe: Xêza şîn pewrdeya bi zimanê zikmakî, li dijî perwerdeya bi zimanekî din (xêza reş) dide nîşan ku di salên perwerdeyê ya ewilîn de performanseke baştir nîşan dane.

Di zimanê kêmaran de perwerdeya bi zimanê zikmakî her çî qas ji aliyê aborî ve guncavtir be jî zêde li ber çav nayê girtin lê ev jî mijarekî girîng e. Di zimanê kêmaran de perwerde, materyalên hevotin-hînkirin û materyalên destpêkê berfirehtir be jî dema bi çavdêriyekê gelemperî bê nihêrîn ji aliyê aborî ye sudek mezin tê wergirtin. Lewra perwerdeya bi zimanê kêmare li dijî perwerdeya bi zimanê fermî, zêdetir mezûnên hîndekariya navîn dide. Li gor hin xebatên ku derbarê vê mijarê de hatine kirin; malîyeta ji bo her dibistanekî gelemperî ku asta wan a serkeftinê baş e berhevdanek hatiye ava kirin û dibistanên ku perwerdeya bi zimanê zikmakî bir e ve tîr birin serkeftineke zêdetir bi dest xistine û ev jî dide nîşan ku ji aliyê aborîyê

ve maliyet hindiktir e. Her weha dema perwerde bi zimanê zikmakî pêk bê malbat jî tev li perwerdeya zarokên xwe dibin û wan baştir fam dikin.²⁷

Wek mînak di Guatemalayê de, ji bo zarokên ku zimanê fermî nizanibûn tasarrufa perwerdeyê zimanê zikmakî, di dibistana seretayî de bi qasî malîyeta 100.000 xwendekarî ango bi qasî 31 milyon quetzalsa (5 milyon dolarên Amerîkayê)²⁸ texmîn dikirin. Xebateke wek vê ku li Maliyê ku hatiye kirin; ji bo dibistanên ku zimanê wan Fransî ye li gor dibistanên ku perwerdeya xwe bi zimanê zikmakî didin tenê %8 kêmtir mesref derketiye. Le belê ji bo perwerdeya 6 salan bi piranî ji ber dubarekirina poan û devjêberdana dibistanan sere xwendekarê %27 zêdetir bûye.²⁹

Pratika ku bingeha xwe ji kîjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 2(2)+13 Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê Aborî, Civakî û Mafên Çandî (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 26, Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê Mafên Sîyasî û Sîvîl (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 5(5), Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê ji bo Cihêkariya bi her Awayî ji Holê bê Rakirin (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 2+28, 29, 30 Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî)
- Hêman 1, UNESCO Hêmanên Ziman û Perwerdeyê (2003)
- Madde 1+4, Peymannameya di Perwerdeyê de Sekna li Dîjî Cihêkariyê (UNESCO)
- Madde 14, Protokol 1, Peymannameya Avrupa ya Mafên Mirovan (Konseya Avrupa)
- Madde 14, Peymannameya Çarçove ji bo Parastina Kêmarên Netewî (Konseya Avrupa)
- Madde 8, Şerta Zimanên Kêmare yên Herêma Avrupa (Konseya Avrupa)
- Madde 4, Danezana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de ne (Neteweyên Yekbûyî)
- Şêwr. 18, Nîşeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran (2013)
- Şêwr 11-18, Şêwra Laheyê ku di Derbarê Mafên Perwerdehiyê yên Netewên Kêmar (OSCE).

²⁷ Child Trends Data Dank, School communication in parents' native language, October 2015, <<http://www.childtrends.org/?indicators=school-communication-in-parents-native-language>>.

²⁸ Patrinos, H. and Velez, E. 'Costs and benefits of bilingual education in Guatemala: a partial analysis', *International Journal of Educational Development*, vol. 29, no. 6 (2009), pp. 594–598, at p. 597.

²⁹ Bankeya Cîhanê (note 2).

Divê çawa bê kirin?

Welatên ku di zimanên kêmaran de xizmetên perwerdeya gelemperî didin piranî li ser sê tiştan vê pêk tînin:

1. Hêmana rêjeyê, piranî bi girêdayî hêmanekê ye lê her dem bi vê hêmanê ve sîordarkirî nîn e. Zêdehiya kesên ku wî zimanî diaxifin, bikaranîna wî zimanî ya ku bere wek zimanê perwerdeyê hatibe bikar anîn û her weha girêdayî bikaranîna çavkaniyan e.
2. Hêmana yekbûna aktif, bi gihîştin û piştgirî dayîna perwerdeya zimanê kêmaran ve têkildar e ku divê ev ziman her tim çalak bibin.
3. Hêmana tevgirî, ji bo tevahiya xwendekaran bi hînkirina zimanê fermî û têgihîna çandên navnetewî ve têkildar e.
4. Bi zimanê zikmakî perwerdeya gelemperî û biqalîte, heta ku berdest be astên jortir ³⁰ û cihên ku yê bê bikar anîn heya asta zanîngehan de bê fireh kirin.³¹ Wek hilbijarte perwerdeya bi zimanê zikmakî divê heta ku ji dest were lê herî kêr di navbera polen 6 an jî 8an de were dayîn. Heger rêjeya xwestinê, belavbûna axivêrên wî zimanî yan jî faktorên din bikaranîna perwerdeya zimanê zikmakî guncavtir neke jî divê rêvebirên dewletê vê perwerdeyê li gor van derfetan pêk bînin. Divê ji rewşa; ji bo hînkirina zimanê zikmakî çend salan perwerdeya bi vî zimanî û pişt re bi awayekî tevahî derbasî zimanekî din bûyîn dûr bê sekinin.

Heger zimanên kêmaran yê tenê di salên perwerdehiya ewil de bê bikaranîn, zimanê din ê jî divê di nav vê pêvajoyê de peyder pey were zêde kirin. Ev helwest dê encamên baştir ji aliyê pedagogîk ve derxe holê.³² Li dibistanên dewletê ku zianê kêmaran wek zimanê perwerdeyê were hilbijartin jî divê azmûnên dawîn jî bi vê zimanê bînin kirin

Zanîngehên dewletê û sazîyên dewletê yê din jî divê şert û mercên xwe yê pejirandinê li gor van zimanên perwerdeyê diyar bikin. Ji bo perwerdeya serdibistanan li gor zimanên kêmaran heta ku derfet hebe divê şert û mercên wekhev bê bikaaranîn ku ji ser cudahiya ziman komek zêdetir nebe xwedî dejavantaj.

Cudahiyên zimanî divê di perwerdeyê de ji bo cudakirina netewan an jî etnîkî wek mazeretek neyê bikar anîn.³³ Dema zimanên kêmaran wek zimanekî perwerdeyê bê bikaranîn, ji binyadên etnîkî û netewî azade ji bo tevahiya kêmaran ev rewş derbasdar bibe di nav xwe de cudatî û faşîzmê jî nahewîne.³⁴

³⁰ UNESCO, Hêmanên Perwerde û Ziman, Hêman 1.

³¹ OSCE, Şêwra Laheyê ku di Derbarê Mafên Perwerdehiyê yê Netewên Kêmar, Şêwrên 17 û 18

³² Dooly, M. and Vallejo, C., *Educational Policies that Address Social Inequality: Thematic Report, Linguistic Minorities* (Faculty of Education, Universitat Autònoma de Barcelona: Barcelona, 2009).

³³ D.H. and Others v. the Czech Republic, European Court of Human Rights, 57325/00, Grand Chamber Final Judgement, European Court of Human Rights, 13 November 2007.

³⁴ Minorities and the right to education: Recommendations of the first session of the UN Forum on Minority Issues (2008), Recommendations 10 and 27.

Ji bo ku tevlêbûn û xweşbînî zêdetir bibe divê tevahiya xwendekaran di derbarê hev de tiştên hîn bibin; divê ji bo kêmaran hînbûn û tevlêbûna çanda netewî nebe asteng. Bi heman awayî divê heman derfet ji bo çand û zimanê kêmaran jî bê peyda kirin.

Çalakiyên perwerdehiyê ku bi zimanê kêmaran ve pêk tên jî di nav de ji bo perwerdehiyên gelemperî çavkanîyên aborî divê berdest bin û di zemîna zimanê de bi awayekî wekhev bîkar anîn. Perwerdeya ku bi zimanê kêmaran pêk tê divê di heman demî de du zimanî be. Ji bo ku zarok di zimanê fermî de jî pêşbikevin divê firsend bînin dayîn. Lê belê gava ev tişt hatin kirin divê zarok ji perwerdeya zimanê xwe yê zikmakî jî bêpar nemînin. Cihekî ku rêjeya wî ji aliyê zimanê kêmaran ve hindikêr be divê pîvana zimanê perwerdeyê jî li gor wî bê par ve kirin. Xwendekarên ku ji cihên navênda bajaran dûr in, divê ji bo wan derfetên rahilîne bînin ava kirin û ew jî herin dibistanên ku bi zimanê wan perwerde didin.

Li cihekî zimanê kêmaran piranî tenê zimanê axaftinê be û mamosteyên wî zimanî bi awayekî profesyonel tune be yan jî materyalên perwerdeyê di wî zimanî de tune be hatiye dîtin ku mamosteyên mahallî, sepanên wergerê yê hêsan û perwerdekarên alîkar li ser hînbûna performansa zarokên kêmaran de gelek kêrhatî ne. Dema di dibistanekê dewletê de hejmara kêmaran ji bo perwerdeya zimanê wan guncav nebe jî divê ji bo perwerdeyên zimanê zikmakî tesîsên taybet û alîkariya aborî bê kirin. Rêvebir divê mufredateke guncav hilberînin û mamosteyên ku vê kare bikin bigihînin. Ji bo bibe wek bersiv, perwerdeya du zimanî jî divê pêk were. Ji xeynî van rêvebir, di bingeha mufredatê de ji bo hînbûna dîrok, çand û kevneşopîya kêmaran jî cih veqetîne.

Bikaranîna Baş

- Li Filipînan, xebatên li ser zêdekirina agahdariyan, daûbavên ji kêmaran girîngîya perwerdeya bi zimanê xwe fêhm kirin û tirsên wan ên ku di derbarê dereng hînbûna zarokan ya “zimanê serdest” jî holê rabû.
- Li Bolîvyayê hikûmet di sala 2008an de, ji bo sê kêmarên herî mezin (Aymara, quechua û Guarani), ji bo serdibistanê di zimanê wan de sê zanîngehan bi navê Universidades Indígenas Bolivianas Comunitarias Interculturales Productivas vekir. Ev zanîngeh di heman demî de ji bo pêşketina van zimanan jî dixebitî.
- Li Senegalê xwendekarên ku bi zimanê zikmakî perwerde didîtin %65, xwendekarên ku bi zimanê netewî perwerde didîtin %50,9 serkeftinî bidest xistine.³⁵
- Li Guatemalayê tê texmîn kirin ku ji bo demeke dirêj tasarrûfa perwerdeya kêmaran ya bi zimanê zikmakî beramberî perwerdeya 100.000 xwendekarî yan jî 5 milyon dolarên ABD ne.³⁶

³⁵ Agence universitaire de la francophonie, *Les langues de scolarisation en Afrique francophone: Enjeux et repères pour l'action, Rapport général* (AUF: Paris, 2010), p. 83.

³⁶ Patrinos, H. and Velez, E (note 28).

- Li Maliyê, ji bo kêmaran, destpêkirina perwerdeya bi zimanê zikmakî rêjeya devjêberdana dibistanê û dubare kirina polan daxistiye, ev encam ku bi perwerdeya tenê zimanê netewî ve bê berhevdan %19 tasarruf derdikeve holê.³⁷
- Li Burkina Faso, Cumhuriyeta Demokratik ya Kongoyê û Eritrê, dema zarok destpêka perwerdeyê 6-8 salan bi zimanê zikmakî dibînin; rêjeya devjêberdana dibistanan û dubarekirina polan dadikeve her weha ji bo hînbûnê jî encamên baştir û sûdên zêdetir derdikevin holê.³⁸
- Li ABDê li dibistanan ragihandin dem abi zimanên kêmaran pêk tê daûbav zêdetir tev li perwerdeya zarokên xwe dibin û nêrîna wan a perwerdeyê baştir dibe.³⁹
- Hindistanê jî di perwerdeyê de hêmana rêjeyê bikar tîne; li dibistanên dewletê de ji sedî 30 zimanên kêmaran tên bikar anîn û bi gelemêrî Hindî û Îngilîzî di dawîya dibistanan de gav bi gav tên hîn kirin.
- Tanzania di sala 2015an de ji bo girîngiya zimanê zikmakî bê nas kirin di tevahiya dibistanên seretayî û navîn de, li dewsa Îngilîzî zimanê Kiswahili bikar anî.
- Li Italyayê kêmarên ku Almanî û Ladînî diaxifin di nav gel de gelek kêman in lê belê ji ber ku ev kêmar li cihekî kom bûne gelek avantaj bi dest xistine. Ev encama di dibistanên dewletê de perwerdeya bi zimanê zikmakî derxistiyê holê û bi rêjeyekê mezin jî axaftina Almanî hebe jî zanîngehên dewletê yên van qadan bi sê zimanan perwerdeya xwe amade kiriye.
- Li Giravên Seyşelê ji bo tevahiya xwendekaran perwerdehî şeş salên ewil bi zimanê Kreyolê ye (hema hema zimanê zikmakî ya tevahiya nifûsê). Îngilîzî piştî sala sêyem kêmtir dikeve nav dersan û Fransî piştî sala şeşan dest pê dike.
- Li Finlandiya û li Kanadayê xwendekarên ku zimanê kêmare (Fransî yan jî Swêdî) diaxifin berbelav in, vesayîten komgûhêz van zarokan ji van cihan radihêle û dibe dibistanên dewletê yên navendî ku bi zimanê zikmakî perwerde didin.
- Li Avustralyayê zimanê Aborjînan zêdetir zimanê axaftinê ye, cihên ku bi zimanê zikmakî perwerdeya formal pêk nayê yan jî materyalên perwerdeyê kêman bimînin bi alîkariya asîstanên mahalî û sepanên wergerê yên resen tên biakr anîn.
- Li Herêma Çîyayî ya Kamboçyayê ji bo naveroka projeya Perwerdeya Zarokan, kesên ji wê heremê û kesên wî zimanî dizanin ji bo kar dihatin hîlbijartin.

4.2. Perwerdeya Taybet

Divê Çi Bê Kirin?

³⁷ Bankeya Cîhanê (note 2).

³⁸ Alidou, H. et al., 'Optimizing learning and education in Africa: the language factor, stock-taking review on mother-tongue and bilingual education in sub-Saharan Africa' (Association for the Development of Education in Africa, Deutsche Gesellschaft für Technische Zusammenarbeit: Paris, 2006), p. 31.

³⁹ Ramirez, A.Y.F., 'Dismay and disappointment: Parental involvement of Latino immigrant parents', *Urban Review*, vol. 35, no. 2 (2003), p. 93.

Ji bo zimanên kêmaran li dibistanên taybet de wek zimanê perwerdeyê bê dayîn divê piştgirî bê dayîn, derfetên dayîna perwerdeyê divê qadî de divê bê zêde kirin û hêsantir bibe.

Divê Çi Bê Kirin?

Divê dewletek ji polîtîkayên gelemperî yên perwerdeyê azade, bi awayekî hiqûqî mafê perwerdeya zimanê zikmakî, berdestiya vê mafê û pêwistiya vê tiştê di platformên navnetewî de beriya demekî dirêj qebûl kirine.⁴⁰

Ev maf hin caran di nav kêmaran de bi bikaranîna şexsan ve jî têkildar e. Kêmarên zimanî ji bo ku werin bişafîn an jî ji bo ku zimanê xwe biterikînin hin caran bi aawayekî qestî hin caran jî bêhemdî têkî zordestiyê tên. Mafê kêmarên zimanî yek jî ji bo ku ji gel cuda nebin divê di zimanê netewî de jî perwerde bibînin.

Pratika ku bingeha xwe ji kîjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 2 (2)+ 13, 14, Peymannameya Navnetewî Derbarê Mafên Aborî, Civakî û Çandî (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 26 û 27, Peymannameya Navnetewî Derbarê Mafên Civakî û Siyasetî (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 5 (5) Peymannameya Navnetewî Derbarê ji Holê Rakirina Cudahiyên Netewî yên bi her Awayî (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 30 Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî)
- Hêman 1, UNESCO Hêmanên Ziman û Perwerdeyê (2003)
- Şêwr. 5(c), Peymannameya di Derbarê Cudakirinan de (UNESCO)
- Madde 10 û 14+ Protokol no. 1, Peymannameya di Derbarê Mafên Mirovî de (Konseya Avrupa)
- Madde 13, Protokol no. 1, Peymannameya di Derbarê Mafên Mirovî de (Konseya Avrupa)
- Madde 8 (2), Şerta Zimanên Kêmare yên Herêma Avrupa (Konseya Avrupa)
- Madde 2,3 û 4 Danezana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de ne (Neteweyên Yekbûyî)
- Şêwr. 18, Nişeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran (2013)
- Şêwr 11-18, Şêwra Laheyê ku di Derbarê Mafên Perwerdehiyê yên Netewên Kêmar (OSCE)

⁴⁰ Minority Schools in Albania, Permanent Court of International Justice, A/B64, Advisory Opinion of 6 April 1935.64.

Divê çawa bê kirin?

Mevzuat divê derfetê bi awayekî vekirî bide ku kêmar di dibistanên taybet de derfetê bide perwerdeya bi zimanê zikamakî. Divê astengî ji bo bikar anîna zimanê kêmareyan li hember dibistana neyên derxistin. Rêvebir ji bo bikaranîna zimanê kêmaran li dibistanan standarteke bikalîte de azad nebin jî divê ji bo zimanê rêvebiriya dibistan û zimanê perwerdeyê astengiyan dernexin. Di heman demê de divê rê vebir li ber îhtimala cudakirinan bigrin û pişgiri bidin ragihandina navberçandîyê. Ji ber vê divê rêvebir, hem îmkana perwerdeya bi zimanê kêmare hem jî îmkana perwerdeya bi jîmanê netewî peşkeş bike.

Mevzuat û polîtîka divê ne tenê li ser perwerdeya taybet ya ji bo zimanên kêmaran de hêsanîyan bike di heman demê de divê bi awayekî aktif piştgirî jî bide.

Wek mînak; heger îmkana tune be û perwerdeya formal di zimanê kêmaran de neyê peşkeş kirin (bi taybetî nifûsên hindik an jî lêcihbûna berbelav hebe) divê perwerdeya taybet bi miqdarên maqûl ve bê fon kirin û bi awayekî fermî piştgirî bê dayîn.

Heger bi awayekî teqez bê gotin, mesuliyeta otorîteyên giştî ji bo fonkirina dibistanên taybet tune be jî⁴¹ divê ji bo parastina cureyên zimanî û çandî piştgirîya bi her awayî bê dayîn. Hin hikûmet henin ku ji bo perwerdeya bi zimanê zikmakî hilberandina materyalan an jî di peyda kirina van materyalan de û bi awayê îstîhdama mamosteyan de piştgirî dide van dibistanên kêmaran.

Piştgiriya ku ji bo tesîsên taybet tîne veqetandin divê ji her awayê cudakirinan azade be. Heger ev piştgiriya ku dewlet ji bo zimanên kêmaran dide bi'edalet nebe ji cihekî şunde hêmana bingehîn a wekhewîyê tê îhlal kirin û bi cudakirinê encam dide.

Sîyasetmedar divê temin bikin ku kesên li van dibistanên ku di zimanê kêmaran de perwerde dibin yê neyên ceza kirin. Divê dîplomayên wan bi awayekî otomatîk bên nasîn, azmûnên wan ên zanîngehan û mûlaqatên ji bo kar divê bi zimanê wan kêmaran be. Ku ji bo derfetên bi ve awayê rewş guncav nebe ji bo hekhewîya wan bê parastin alternatîfên din divê bên kirin. Ev wek cihên di cihên guncav de vekirina zanîngehên bi zimanê wan kêmaran û her wekî din be. Heger bê pîvan ku zarok ji perwerdeya zanîngehan mahdûr bimînin û bên veder kirin ev dibe cihêkarî.

Bikaranîna Baş

- Japonya xwendekarên ku ji dibistanên taybet yê Koreyê mezun bibin ji bo zanîngehan dipejirîne.
- Li Malezyayê ji 1960an vir ve dibistanên nîv dewletî û nîv taybet zimanê Mandarînan wek zimanê perwerdeyê bikar tîne. Dibistanên dewletê yê seretayî di vê zimanê de perwerde didin.

⁴¹ Waldman v. Kanada, Komîteya Mafên Mirovan ya NY, CCPR/C/67/D/694/1996, 3 Sermawez 1999.

- Li Kazakistan û li Litvanyayê li gor peymannemeyên dualî ku bi dewletên din re hatine destnîşan kirin de, pêşiya perwerdeya bi zimanê kêmaran li zanîngehên bîyanî vekirine. Li Litvanyayê kampusa zanîngeha dewletê ya Polonyayê bi navê Bialystokê heye û bi zimanê Lehkî qursan dide bi vê awayî bi zimanê kêmara herî mezin li wî welatî perwerdeya di asta zanîngehê de tê dayîn.
- Li Başurê Taylandê xwendekarên (6-7 salî) ku sê salên ewil bi zimanê xwe yê zikmakî (Zimanê Malay) perwerde dîtine li gor xwendekarên bi tenê di zimanê Tay de perwerde dîtine di dersên “xwendin”, “matematik”, “zanistên civakî” û “zimanê Tay” de %40 serkeftîtir derketine. Zarokên kurîn yê Malay %123 di dursa matematikê de serkeftî bûne û azmûnên xwe derbas bûne.⁴²

4.3. Xizmetên Îdarî, Xizmetên Tenduristî û Xizmetên Giştî yê Din

Divê Çi Bê Kirin?

Dema ku şert guncav bin divê di qadên xizmetên îdarî, tenduristî û xizmetên giştî yê din de gihêştina zimanê kêmaran hêsan be.

Divê Çima Bê Kirin?

Ji bo niştecihên kêmar, heger şert û mercên dewletê ji bo hînkirina zimanê wan kêmaran guncav be divê qet astengî nekevê, qedexekirina wî zimanî dernekeve holê û pêkanîna van qedexeyan bi darê zorê neyên cih, ku ev tişt bibin jî li gor hiqûqa navnetewî ev dibe cihêkarî.⁴³

Çavkanîyên dewletê yê aborî ji bo tenduristîya civakî, xizmetên civakî yan jî ji bo weşanan divê bi'edalet bê xerc kirin. Dibe ku bikaranîna zimanekî netewî li gor bikaranîna pirzimanî yê kêmaran zêdetir bimesreftir be. Bi tenê bikaranîna zimanê serdest ji bo kêmaran, bi taybetî li ser jinên ku li benda xizmetê ne, divê bibe hêmaneke pêximker.⁴⁴

Li gelek welatan tedbîrên di derbarê xizmetên zimanî, îdarî, tenduristî û xizmetên din, bi awayekî maqûl û bi pîvan; çalakbûna pêşkêşîya ragihandinan, kalîteya xizmetên ku komên pê re tên parvekirin û tevlêbûna kêmaran li jiyana civakî û giştî de encamên erênê derxistiyê holê. Li hin welatan jî daye nîşan ku kesên bi zimanê xwe jiyana xwe berdewam dikin têkiliyên wan ên hukumî baştir in û rêjeya wan a bêkarîyê hinidktir e.

Divê sîyasetmedar, çêkerên zagonan û rêvebir van tiştan piştguh nekin:

⁴² Kosonen, K. ve Person, K.R. (not 21).

⁴³ Diergaardt et al. v. Namibia (not 12).

⁴⁴ Ishida K. et al., 'Ethnic inequality in Guatemalan women's use of modern reproductive health care', *International Perspectives on Sexual and Reproductive Health*, vol. 38, no. 2 (2012), pp. 99–108.

1. Wergirtin, di rewşên guncav de divê zimanê kêmaran bê bikar anîn. Ji bo ku rêvebir xwe bigihînin kêmaran û bi wan re têkilîyên xurt daynin an jî ragihandina di navbera wan de baştir bibe bi qasî ku derfet hebin zimanên wan kêmaran bikar bînin.
2. Li gor derfetan bikarnameyên zimanên kêmaran, dibe sedema encamên bêbandor (kes dibe ku zimanê netewî nizanibin an jî baş fêm bikin) û dibe sedema musrifîyê (çavkanî ji bo ragihandinê bi awayekî tasarruf nayên bikar anîn).
3. Bikaranîna zimanên kêmaran, li ber rêya vederkirina kêmaran di qadên polîtîk û giştî de kêmtir dike. Her weha dewlet dema van zimanan bikar bînin hebûna kêmaran di zasîyên dewletê de zêdetir dibin.

Pratika ku bingeha xwe ji kîjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 2 (2)+ 9, 10, 12, 15, Peymannameya Navnetewî Derbarê Mafên Aborî, Cîvakî û Çandî (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 26, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Medenî û Siyasetî de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 5 (a) û 5 (e)(4), Peymannameya Navnetewî Derbarê ji holê Rakirina Cudahiyên Netewî yên bi her Awayî (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 2+28, 29 û 30, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 24, 25, û 30, Peymannameya di Derbarê Gelên Nîştecihên Welatên Azad û Eşîretan de (no. 169) (Sazîya Navnetewî ya Xebatê).
- Protokol no. 12, Peymannameya di Derbarê Mafên Mirovî de (Konseya Avrupa).
- Madde 10(2), Peymannameya Çarçove ji bo Parastina Kêmarên Netewî (Konseya Avrupa).
- Madde 10 û 13, Şerta Zimanên Kêmare yên Herêma Avrupa (Konseya Avrupa).
- Şêwr. 11, Nîşeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran (2013).
- Şêwr 13-15, Şêwra Osloyê ku di Derbarê Mafên Zimanî yên Netewên Kêmar (OSCE).

Divê çawa bê kirin?

Dema xizmetên tenduristî, civakî û xizmatên din ên giştî bûn mijar, bikaranîna zimanê kêmaran di heman demê de ji aliyê qalîte, dem û wekhevîyê re jî di xwe de dihevinê.⁴⁵

Ji bo pêkanîna mafên zimanî yên kêmaran piranîya welatan hêmana pîvanê bikar tînin.: xizmet piranî, tenê bi vî awayî nebe jî, li gor hejmara wan bi zimanê van kêmaran ve pêk tê. Ev pîvana bikaranîna zimanê kêmaran kifşe dike û pêkatin yê bi destê kîjan sazîyan ve

⁴⁵ Diergaardt et al. v. Namibia (not 12).

bê cih kirin jî kifşe dike. Li piranîya welatên dunyayê de pirjimanî hem di xizmetên giştî de hem jî di rêvebirîyê de bi awayekî bibandor tê pêk anîn.

Ne mecburiye ku zimanê her kêmarî di xizmetên rêvebirî û giştî de bîn bikar anîn, bi tenê li gor rêjeyê û nifusê divê awayekî maqul zimanên ku pêwistin bîn bikar anîn. Cihên ku hejmara kêmaran zêdetir be divê li rêvebirîyan û xizmetên giştî de ev kêmar bikaribin zimanê xwe wek zimanê fermî heta astekî bikar bînin. Girîngîya encama bikaranîna zimanê kêmaran di qadên xizmet û rêvebirîyan de çî cidî be, dê rêvebir jî ji bo van koman ew qas baldar bin û ragihandin û têkilîyên baştir peyda bibin. Wek mînak ji bo tenduristiya civakî bikaranîna zimanê kêmaran tişteke heyatî ye. Dema hêmana rêjeyê ku bê bikaranîn, di xizmetên tenduristîyê de ku cih ji bo xebatên pirzimanî û duzimanî bê kirin hem têvlêbûn zêde dibe hem jî zêdetir xîtabê kesan dike. Wek ku bikaranîna teknolojiyên nû û internetê divê li cihên ku kêmar ê jîyan dikin jî berbelav bibe yan jî bikaranîna van komên biçûk bîn teşwîq kirin.

Bikaranîna van mafan yê li ku dere û bi çî awayî bîn sererast kirin divê li mevzuatê bîn nişandan, ji bo bêîtaatîyê û telafîya wê mekanîzmayên parastinê divê bîn hildan.

Bikaranîna Baş

- Berpirsiyar li Îzlandayê di qadên xizmeta civakî de ji bo ku bi gel re ragihandineke baştir pêk bînin ji xeynî Îzlandî li Navenda Agahîyên Pirzimanî û li ser telefonê bi heft zimanan (Îngîlîzî, Lehkî, Sirpkî, zimanê Tay, Spanyolî, Lîtvani û Rusî) ragihandin pêk tîne.
- Di Krîza Ebolayê de li Bakurê Afrîkayê, rêvebiriyên tenduristîyên Sierra Leone, Gine û Liberya bi hevkarîya UNICEFê re ji bo ku zêdetir ber nexweşiyê bigrin, zûtir û ewletir xwe bigihînin kêmaran bi alîkarîya şanoyên radyoyan, materyalên ku tene weşandin, bernamêyên televîzyonan û posteran bi zimanê wan bikar anîn.
- Li Îrlandayê, cihên ku guncav bin û bi taybetî komên mezin ên kêmaran li vir dijîn kontratên mal û kirayan bi zimanê Îrlandî yan jî bi zimanên derveyî Îngîlîzî tê bikar anîn.
- Bostvanaya ku lê du ziman tê axaftin, xebatkarên kamuyê bi gelemperî (nêzikê %78an) zimanê ku tê famkirin Setswana yan jî bi Îngîlîzî diaxifin. Li bakurojavayê ku kêmar li wir zêdetir dibin, ji bo bandorîya zêde û aboriya kêma wek zimanên Yeyî tîn bikar anîn.
- Li Avustralyayê, ji bo nexweşxaneyan di zimanê Aborjînan de bi awayê anîmasyon sê dîmen hatine amadekirin û ev yek beramberî şoreşekê ye.
- Zagon li Mîrnişînîya Yekbûyî, bi peywira “divê ji bo her kesî xwe gihîştina agahiyên tenduristî” hewl didin, xebatkarên tenduristîyê mecbur dimînin ku alîkarîya kesên ku Îngîlîzîya wan baş nîn e jî bikin. Ji ber vê, xizmetên tenduristîyê bi qasî ku mumkun e bi du zimanî, bi alîkarîya wergêrên rû bi rû yan jî bi telefonê, dîmen û belgeyên tîbbî ku hatine tercûme kirin ve xizmet tê dayîn.

- Wezareta Tenduristîyê ya Meksîkayê, li navendên tenduristîya gel de ofîsên zimanên niştecih ava kirin e, ev pêşveçûn di sala 2010an de li nexweşxaneyên Chiapas, San Cristobalê Hospital de las Culturas de dest pê kirine.
- Li Etîyopyayê xizmetên ku ji aliyê hikumetê ve tê dayîn li gor wan cihan bi zimanên wan kêmaran ve (Somali, Tigrigna, Oromifa û Harari) tên dayîn.
- Li ABDê mevzuata wekhevî ya federalan de bikaranîna zimanên Spanyolî, Farisî û Vietnamî li gor nîfûsê ji bo 10.000 kesî, wek %5 hatiye kifşe kirin.
- Li Fînlândiyayê ji bo xizmetên kamuyê yê cur bi cur bi pîvan be hatiye qebul kirin ku %8ê nîfûsê Swêdî ne yan jî 3.000 kes wek kêmarên zimanî ji aliyê şaredariyan ve jî tên qebul kirin. Ji ber sedemên dîrokî hem Swêdî hem jî Fînî di asteke netewî de wek zimanên fermî tên qebul kirin. Kêmareke ji wan biçûktir jî Samî jî li devera xwe (li welat nêzîkî 7.500 Samî dijîn) di navendên tenduristîya gel û li xizmetên giştî yê din de bi zimanê (Sámiid ruovttuguovlu) xwe xizmet hildidin.
- Li Kanadayê jî xeynî zimanê fermî ji bo ku zimanekî kêmaran (Fransî û Îngîlîzî) li wê deverê bê bikaranînê dîvê li gor bîjartîna nîfûsê ew zîman li wê deverê %5 bê axaftin ku mafên zimanên kêmaran li gor rêjeyê jî were pêkanîn.
- Li Brezîlê jî xeynî zimanê Portekîzî zimanên penaber û kêmaran jî her ku diçe zêdetir dibe. Li São Gabriel û li Cachoeirayê rewş, tê vê wateyê ku hem di ragihandina di navbera rêvebir û gel de hem jî reklamên ku li ser medyayê tên nişandan û xizmetên bingeîn bi çar zimanan (Portekîzî, Nheengatuyî, Tukanoyî û Baniwayî) tê axaftin û bikaranîn.

4.4. Nasname û Zimanên Kêmaran

Divê çi bê kirin?

Divê rêvebirên dewletê ji bo hilbiratîna nav û paşnava kesan rêzê bigrin. Ji bilî vê divê ev nav bîna pejirandin û bikar anîn. Cihên ku bikaranînan zimanê kêmaran gincav in, bi taybetî jî cihên ku kêmar li wir dijîn divê di navên kolan û tabelayên topografîk de zimanên kêmaran bîna bikar anîn.

Divê çima bê kirin?

Di navenda mafên kêmaran de parastin û pêşxistina nasnameya kêmaran heye. Ev di heman demê de ji bo jiyana taybet û ji aliyê rûmetê ve jî gelek girîng e. Ji bo gelek kesan nîşaneyên nasnameya wan a herî sereke navên wan ên bi zimanê wan in. Ziman; ji bo xwezaya însan, çand û civakî di navenda nasnameyê de cih digre, ji ber vê ev parastina navan bi zimanê xwe di heman demê de divê rêzê re bê girtin û bê parastin.⁴⁶ Rêza li gel nasnameyê, parastina wê û

⁴⁶ Office of the UN High Commissioner for Human Rights (OHCHR), *Minority Rights: International Standards and Guidance for Implementation* (OHCHR: Geneva, 2010), p. 8.

berpirsiyariya rêzgirtina wê bi kesan re sînorkirî nîn e û divê li cihên ku kêmar li wan deran dijîn belavtir bibe.

Pratika ku bingeha xwe ji kêjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 17, 24, 26, û 27 Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Medenî û Siyasî de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 5, Peymannameya Navnetewî Derbarê ji holê Rakirina Cudahiyên Netewî yên bi her Awayî (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 2+7, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 10, Peymannameya di Derbarê Mafên Mirovî de (Konseya Avrupa).
- Madde 11, Peymannameya Çarçove ji bo Parastina Kêmarên Netewî (Konseya Avrupa).
- Madde 10, Şerta Zimanên Kêmare yên Herêma Avrupa (Konseya Avrupa).
- Şêwr. 13, Nîşeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran (2013).
- Şêwr 1-3, Şêwra Osloyê ku di Derbarê Mafên Zimanî yên Netewên Kêmar (OSCE).

Divê çawa bê kirin?

Li piraniya welatan ji bo nav û paşnavên di zimanê kêmaran de hatine pejirandin û otorite ji bo vê mafê rêzê digre û berpirsiyariya vê tiştê jî digre. Divê di mevzuatan de bê gotin ku divê ew kes navên xwe yên bi zimanê xwe di her qadê de bikaribin û di karên fermî de jî rêvebir bi awayekî hêsan navên wan bikar bînin. Her weha divê mevzuatê jî hebe ku ji ber politikayên bişaftinê yan jî politikayên wek bişaftinê, di demên berê de ku kes navên xwe yên bi zimanê kêmarin guherandibin divê bi awayekî hêsan û bi şertê zêde buhanebûnê bikaribin dîsa biguherînin.

Naveke taybet (navên şexsan û navê malbatan) wek pêvek divê rêvebirên dewletê, navên van şexsan (belgeyên jidayîkbûnê jî di tê de) di zimanê wan de qebûl bikin û bikar bînin.

Divê ji aliyê rêvebirên dewletê ve navên bi alfabetên cuda tên nivîsîn (ji bo Erebi Latîni ji bo Çini Kirîli) jî wergera tîpan bê kirin. Bi awayekî din ku bê vegotan, divê rêvebir navên bi alfabeke din ku hatine nivîsîn wergera wan tîpan bi awayekî herî nêzik divê bikin.

Ku ev nav bi zimanê din bên nivîsîn lê ji bo alfabeke cuda pêwistî tune be (Spanyolî, Îngîlîzî, Lîtvani, Lehkî) divê rêvebir yeke yek van navaan bîyî wergerandin bikar bînin.

Navên kolan-mehelle û topografîk ji bo kesên li wan deran dijîn bi qasî nasnameya civakî, çandî û dîrokî girîng e. Li piraniya welatan bi derfetên ku guncav in tiştê tê bikaranîn; divê rêvebir ji bo cihên ku kêmar li wir dijîn yan jî bi rêjeya kêmaran ve bipîvan, lewhayên du zimanî yan jî sê zimanî divê bên nivîsîn û mevzuat jî derfetê ji bo vê tiştê bide. Di nav mevzuatên netewî de guherîn pêk were jî, ji bo nifusên kêmaran %5 an jî %20 be diguhure. Rêzeya herî kêr bi taybetî

xwedîyê statuyek fermî ye yan jî bi sedemên kevneşopî/dîrokî têkilîya wan bi bikaranîna zimanê kêmaran heye. Ji bo ku bikaranîneke bibandor be divê ev bikaranîna tabelayên bi zimanê kêmaran wek fermî bê qebûl kirin. Ev lewhayên pîrzimanî didin nîşan k udi navbera komên civakê de ragihandina bi vê awayê parvekirinan û rêzê dide nîşan.

Bikaranînen baş

- Li Bulgarîstanê ji bo kêmarên Tirk, ku guherandina navan pêk hatîye pişt re wergera wan navan hatîye kirin.
- Îzlanda mecburîyeta navên bi Îzlandî di demeke nêz de rakir.
- Ji sala 2010an vir ve li Fasê navên bi zimanê Amazîgh wek navên “ayîdê Fasê” tên qebûl kirin û pêşnavên bi vê zimanê ji aliyê rêvebiran ve tên bikar anîn û qebûl kirin.
- Li Arnavutlukê mevzuatên fermî derfet didin ku navên kevnare werin wergerandin li gor rêzîkên zimanên kêmaran a zimannasîyê û çandî.
- Li Federasyona Rusyayê di tabelayên kolan û tabelayên topografîk de pîranî duzimanî tê bikar anîn. Ji xeynê vê di van tabelayan de ji bilî Rusî zimanên cumhuriyetên din ên ku di binyada avakirinê de cih girtine (dever/eyalet an jî zimanê Kraîyan) jî heye.
- Li Çînê tabelayên kolan û topografîk, li cihên ku hejmara kêmaran zêde dibe (Moxolî, Uyгурî û Tîbetî) li van deran ev tabela bi pîranî dibe du zimanî yan jî sê zimanî. Tabelayên sê zimanî li Cezayîr, Sîngapur û Swêdê jî tên dîtin.
- Li Kamerun⁴⁷ û li Yekîneya Welatên Amerîkî⁴⁸ jî di nav de, projeyên li ser zimanên ku li ber wendabûnê ne tên kirin.

4.5. Di Qadên Darazî de Zimanên Kêmaran

Divê çi bê kirin?

Ji endamên kêmaran yek heger were binçav kirin û zimanê fermî nizanibe divê wergêrek hem ji bo parastin hem jî ji bo belgenameyan, bêbuha were dîtin. Belgenome û rewşa lêpîrsînê divê bi awayekî rêk û pêk ji her aliyê ve were wergerandin.

Kar û barên dadgehan li cihên ku herjmarên kêmaran têrê dike yan jî rêjeya wan têrê dike de divê bi zimanê wan pêk were.

Divê çima bê kirin?

Di pêvajoya dadgerîyê de bikaranîna zimanên ku ji aliyê kesan ve tên famkirin gelek girîng e û di qadên navnetewî de ji aliyê hiqûqê ve jî ji aliyê lêpîrsînên bêalîgir girîng e. Ji ber vê ji bo lêpîrsînên dadgerî û lokal kesên ku zimanê kut ê bikaranîn fêhmî neke divê ji bo wan kesan her dem û bi awayekî ku têrê bike wergêrên bêbuha hebin. Her weha girtî/bersûc bi vê awayê dikare mafê xwe yê parastinê baştir bikar bîne û edaleta darazîyê bicîh bibe. Ji xeynê vê, ji bo hêmana

⁴⁷A/HRC/25/56/Add.1

⁴⁸<http://recoveringvoices.si.edu/index.htm>

rêjeyê jî bê bikaranîn li gor wan pîvanan karen dadgehan bi zimanê kêmaran jî divê bê kirin û bi awayekî edalet pêvajo bi rêk û pêk bibe.

Bingehên Zagonî (Yên Nezagonî)

- Madde 14, 26, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Medenî û Sîyasî de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 5 (a), Peymannameya Navnetewî Derbarê ji holê Rakirina Cudahiyên Netewî yên bi her Awayî (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 40, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 6, 14, Peymannameya di Derbarê Mafên Mirovî de (Konseya Avrupa).
- Madde 10 (2) & (3), Peymannameya Çarçove ji bo Parastina Kêmarên Netewî (Konseya Avrupa).
- Madde 9, Şerta Zimanên Kêmare yên Herêma Avrupa (Konseya Avrupa).
- 2010/64/YA Dîyalektîka di Derbarê Mafên Wergerên Nivîskî û Devkî Parlementoya Avrupa û Konseya wê ya di Dîroka 20.10.2010an de Dazirandinên Cezayê (Konseya Avrupa).
- Şêwr. 11, Nîşeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran (2013).
- Şêwr 17-19, Şêwra Osloyê ku di Derbarê Mafên Zimanî yên Netewên Kêmar (OSCE)

Divê çawa bê kirin?

Di mijara bikaranîna qadên darazîna zimanê kêmaran de, ji xeynî hêmanên pîvan û darazên bidalet têgeha “*wekhevîya alîyan*” jî rêzemaftan mumkun dîkin.

Ku kesek bersûc be, bi çî sûcê ve tê sûcdarkirin divê sedem û wesfa tişta ku pê tê sûcdarkirin bi zimanê ku dizane ve bidîna zanîn.

Ev rewş tenê ji bo endamên kesên kêmarên ku bi zimanê netewî bi awayekî herikbar dizanin derbasdar nîn e. Gihîştina mafê edaletê jî di tê de divê ji bo xizmetên giştî, bandorîya wê û pratîkbûna wê hêman pîvanê bê bikar anîn. Divê di mafên hiqûqî de cihê mafên zimanî jî div an qadan de cih bigre.

Li gel parastina mevzuatê, ji ber sedemên kêmahîya derfetên aborî, kêmasîya wergerên profesyonel, nezanîna bersûc her dem bi awayekî sistematîk divê bi cih nebe. Ev rewş bi taybetî ji bo komên biçûk ên kêmaran derbasdar e û rê li ber xetayên hiqûqî yên mezintir vedike. Ji bo ku mafên zimanî yên kêmaran bi awayekî erênî bi encam bibe ji aliyê dewletên cuda ve hewldanên baştir weha ne:

- Li dadgehan û li qereqolan hebûna alavên wek poster û broşuran bi zimanê wan kêmarên ku li wan cihan dîjin, di naveroka wan alavan de jî divê mafên wergerên bêbuha û hem nivîskî hem jî devkî cih bigrin.

- Divê qeyda wergêrên profesyonel bê girtin;
- Heta ku bi darazîneke neheq dernekeve holê teknolojiyên konferansên bidîmen, telefon an jî internet werin bikar anîn.
- Divê hakim an jî berpirsiyarên dadgehan bi awayekî hiqûqî, li ser bikaranîna zimanê bersûc biryar bidin ku dikare xwe îfade bike;
- Mafên itiraza nepêwistîya wergerê û piştî ku werger hat kirin ji bo naveroka wê mafê îtirazê divê bê dayîn.

Bikaranînen baş û tawsîye

- Di dewletên endamên Yekîneya Avropayê de, li dadgeh û qereqolan de broşûrên agahdarîyê, ji bo ku mafên bersûc li ser mafên xwe agahdar bike, di zimanê kêmaran de hebin. Ji xeynî vê divê îmkana wergêr û wergerên bêbuha û profesyonel jî bê dayîn.⁴⁹
- Li Başûrê Afrîqayê Wezareta Edaletê, ji bo ku kalîteya xizmetê zêdetir bikin bi çar zanîngehan re karekî hevpar kirine û Dîplomaya Wergêrîya Hiqûqî ava kirine.
- Li Hindistanê di salên dawî de ji bo ku wergêran jî tev lê bikin, bi rêya konferansên bidîmen teknolojiya ragihandinê hatine bikar anîn.
- Li cihekî ku hejmara kêmaran zêde dibe yan jî ji ber bikaranîna wî zimanê hêmana rêjeyê tê bikaranîn, hin dewlet ji bo hin rûniştanên dadî bikaranîna zimanê kêmaran pêşniyar dikin, her çî qas hindikane ji alîyê hakim ve bê axaftin jî ev xwestek jî di nav mafên kêmaran de divê hebe.
- Li eyaleta Îtalyayê Bolzano/Bozenê kar û barên dadgehî bi tevahî bi zimanên Îtalî û Almanî pêk tên.
- Li Slovenyayê, li gor hêmana rêjeyê ya kêmaran cihên ku hejmara kêmaran zêde dibin şaredarî, dadgeh bi zimanê Îtalî yan jî Macarî ne.
- Li Kanadayê dadgehên temyîzê ku mijarên cezayê hildidin dest, li Saskatchewanê dawayan bi tevahî yan jî piranî bi zimanê kêmaran Cree ve bir e ve dibe. Her weha mecburiyeta bikaranîna zimanên Înuîtçî û Fransî jî li gor nifûsê heye.

4.6. Medya û Zimanên Kêmaran

Divê çawa bê kirin?

Ji bo ku kêmar bikaribin xwe bi awayekî azad îfade bikin, di navbera xwe de û di nav zimanên din de bikaribin bi axifin divê ji alîyê bikaranîna medyaya elektronîk ve azad bin.

Di bergehên giştî de ji bo zimanê kêmaran divê cihek bê veqetandin. Ji bo kêmaran bi pîvaneke maqûl divê hebuna wan hem ji alîye endamên komê hem jî ji alîyê endamên komên zêdetir ve bê dîtin û bihîstin.

⁴⁹Council of the European Union, Directive 2010/64/EU of the European Parliament and the Council of 20 October 2010 on the right to interpretation and translation in criminal proceedings.

Divê çima bê kirin?

Tevahîya hikumetan bi hêmanên “pîvan, xweşbînî û vekirîbûna fikran” girêdayî, divê ji bo her komê û kêmarekê xizmeta medyaya bi zimanê xwe garantî bike.⁵⁰ Li gor mafên însanî azadîya îfadeya bi zimanê xwe di medyayê de jî divê bê bikaranîn û têkî astengîyan nebe. Divê li gor rêje û pîvanê qadên medyayê bi awayên ewle vê tiştê bikar bîne. Ji bo qadên taybet ji aliyê aborîyê ve divê destek bê peyda kirin lê bi şertê bêyî cudahî bikeve nav. Qebûlkirina zimanê kêmaran di qadên taybet û giştî de ne tenê ji bo mijara xweşbînîyê her weha ji bo pêwistîyan, menfaatên bîdaxî û ji bo hesta yekîtîyê jî girîng e.

Pratika ku bingeha xwe ji kîjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 19, 26, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Medenî û Siyasî de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 5, Peymannameya Navnetewî Derbarê ji holê Rakirina Cudahiyên Netewî yên bi her Awayî (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 2, 17 & 30, Peymannameya Navnetewî di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 11+14, Peymannameya di Derbarê Mafên Mirovî de (Konseya Avrupa).
- Madde 11, Şerta Zimanên Kêmare yên Herêma Avrupa (Konseya Avrupa).
- Madde 2(1), Danezana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de ne (Neteweyên Yekbûyî).
- Şêwr. 13 & 15, Nişeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran (2013).
- Şêwr 8-11, Şêwra Osloyê ku di Derbarê Mafên Zimanî yên Netewên Kêmar (OSCE).

Divê çawa bê kirin?

Dema dewlet ku daxilê medyaya giştî bû divê rewş çand û cudahiyên zimanî jî bide nîşan. Ew, bikaranîna rêjeya zimanên kêmaran jî ji aliyê weşangeran ve jî dide nîşan. Di heman demê de divê menfaatên kêmarên biçûk jî bi vî awayî were holê.

Ji bo bikaranîna van medyayan bi awayekî guncav divê bi pirzimanî be û bi vî awayê di standardên netewî de, bigihîje hemû kêmaran.

⁵⁰ OSCE High Commissioner on National Minorities, Guidelines on the use of Minority Languages in the Broadcast Media, October 2003.

Di welatekî de heger piranîya nifûsê du zimanî be divê bi awayekî vegerek weşan bi wan du zimanan bin. Weşanên giştî dewsa ku van wek tune hesêb bike dikare cudahiya wan kêmaran wek zengîniya wî welatî qebûl bike û bide nîşan.

Kêmar, ji bo pêşxistina van weşanan divê bi awayekî raste rast daxilê vê pêvajoyê bin. Dema ku zimanê kêmaran di weşanên giştî de bîn bikaranîn bi vê awayê ziman, çand û nasname jî tê parastin.

Her weha gihîştina di zimanê xwe de medyayekî dibe sedema agahî û ragihandineke baş ya navbera rêvebir û kêmaran. Her weha kêmar jî jiyana giştî û civakî îzole nabin.

Ku bi awayekî objektîf bê nihêrîn pêvajoya ragihandin, agahî û yekbûn bi du alîyan ve pêk tê. Ji ber vê medyaya giştî divê ne tenê kêmaran, zêdehiyan jî bixe nav xebatan. Bi vê awayê divê rêvebir jî ji bo hînbûna zimanên kêmar û netewî teşwîq bike, pirsgerêkên kêmaran bi de berçavan û weşangerîyeke pîrzimanî û pîrçandî pêk bîne.

Hêmana rêjeyê piranî ji aliyê medyaya giştî ya dewletê ve tê bikar anîn û piranîya dewletan di vî qadî de pêkanîneke pratîk jî dike. Nêzîkahiyên cuda hebin jî, di zimanê kêmaran de weşanên medyayê bi awayekî fermî piştî xwe dide sedemên wek, gihîştina bicîh a wekhev, pêwîstî û menfaatên kêmaran û li gor pîvan û nifûsê divê ev xizmet hebin.⁵¹

Azadiya vegotinê di nav xwe de van tiştan dihevine; vegotina kêmaran, ragihandina di navbera kêmar û kesên din, her weha ragihandineke azad dihevine.⁵²

Bi taybetî ku dema van weşanan bê kurtkirin ji bo azadiya vegotinê dibe bibe sedema cudakerîya vegotinê û yê barekî aborî bi awayê cuda bi xwe re bîne, ji ber vê divê ev medya ji kotayên zimanên fermî xwe biparêzin.⁵³

Bikaranîna baş

- Li Meksîkayê Komîsyona Neewî ya ji bo Pêşxistina Gelên Niştecih nêzîkî 30 zimanên kêmaran bi alîkarîya 20 radyoyan, piştgirîya aborî dide.
- Li Kosovayê rêvebir ji bo piştgirîya aborî ya medyaya kêmaran Fona Medyaya Kêmaran ava kirin.
- Mevzuata Kanadayê dibêje ku ‘Kanada divê du zimanîya civakê, hebûna pîrçandîya wî û cihê Aborjîna ya taybet’ nîşan bide. Ew pêwîstî bi tahsîskirina frekansan, lîsansdayîna îstasyonên radyoyan û bi piştgirîya aborî encam daye.
- Li Katalonyaya Spanyayê, rêvebir ji bo hebûna zimanî bihêztir bikin, îmtîyaz didine radyoyên Katalanî ji aliyê aborî û bac ve.
- Li Rusyayê weşangerên dewletê VGTRK (û sazîyên girêdayî) bi gelemperî hêmana rêjeyê berçav digrin. Bi ve nêzîkbûnê ve kesên ku zimanê Tatar diaxîfî –Perm û Tyumen

⁵¹ OSCE High Commissioner on National Minorities, Guidelines on the Use of Minority Languages in the Broadcast Media, Guideline 15, October 2003.

⁵² Ouranio Toxo and Others v. Greece (note 9).

⁵³ Council of Europe, Advisory Committee on the Framework Convention for the Protection of National Minorities, The Language Rights of Persons Belonging to National Minorities under the Framework Convention, Thematic Commentary no. 3, ACFC/44DOC(2012)001Rev, July 2012.

jî di nav de- cihên ku Tatarîstan zêde ne bi weşanên TV û Radyoyê ve encam dabe jî kêmarên ji wan biçûktir jî li gor rêje û nifûsê hindiktir dema weşanê hilgirtine.

- Avusturya û Macarîstan xwedîyê nifûseke pirzimanî û niştecihên bela wela ne. Li wir radyo û televîzyonên online ku bi pirçandî û zimanî weşan dike heye. MR4 zêdetir bi Hirvatî, Almanî, Romanê, Sirbî û Slovakî rojê du saetan weşan dikin, ji xeynî vî ji bo zimanên hindiktir di heftê de 30 xulek weşanên xurtir tê kirin û ji bo Romenan di heftê de pênc roj weşanên yek saetî tê kirin. Ev weşan bi awayên online bi 13 zimanî ve tê kirin.
- Li welatekî ku rêzeyek mezin bi du zimanî be li wan cihan cerabandina weşanên du zimanî di heman demî de jî divê bê kirin an jî wek ku Kamerun, Seyşelî û Mauritius dikin di bernameyekê de her du ziman jî li cihê hev dikarin bên bikar anîn.

4.7. Di Çalakîyên Taybet de Mafên Zimanî

Divê çi bê kirin?

Di raya giştî de yan jî derdorên giştî de rewşên ku pêk tên jî di nav de; aborî, civakî, polîtîk, çandî yan jî çalakîyên rewşên taybet divê garantortîya bikaranîna zimanê kêmaran bike.

Divê çima bê kirin?

Bikaranîna herêmên zimanî jî di nav de, kesên di qada şexsî de bin, ev dibe tabetîya civakên azad û demokratîk. Di encama vê de jî –rewşên ku bi zagonan hatîne asteng an jî qedexekirin ne di nav de- divê zimanê kêmaran ji bo bikaranîna taybet jî were garantî kirin.

Pratika ku bingeha xwe ji kîjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 19, 26, & 27, Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê Mafên Siyasî û Medenî de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 5(d) (8), & (9), Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê ji bo Cihêkarîya bi her Awayî ji Holê bê Rakirin (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 13, 30, Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê Mafên Zarokan de (Neteweyên Yekbûyî)
- Madde 14 + 10, 14 + 11, Peymannameya Avrupa ya Navnetewî ya di Derbarê Mafên Mirovan de (Konseya Avrupa)
- Madde 10 (1), Peymannameya Çarçove ji bo Parastina Kêmarên Netewî (Konseya Avrupa)
- Madde 2, Danzana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de ne (Neteweyên Yekbûyî).
- Şêwr 4, 6, 8, 12, Şêwra Osloyê ku di Derbarê Mafên Zimanî yên Netewên Kêmaran de (OSCE).

Divê çawa bê kirin?

Ji ber ku ziman alavekî îfadekirinê ye, di qadên giştî de (demên kut ê dîtin û bihiştin jî di nav de) alîyên taybet divê derfetê bidin ku kêmar zimanê xwe di navbera xwe de bikar bînin. Zimanê k udi hevdiştinê taybet de jî ku tê bikaranîn jî divê wek vê bê parastin.

Zimanekî kêmaran di çalakîyekê taybet ya çandî de⁵⁴ an jî di çalakîyên hilbijartinan de⁵⁵ ji bo bergeha bikaranîna ziman divê rêz bê girtin.

Divê ji alîyên daûbavan yek ku zimanê kêmaran bikarbîne û ev bibe sedema meşru ya jîdestdayîna welayeta zarokek, ev dibe bikaranînek xelet.

Parastin û pêşxistina zimanên fermî armanceke meşru ye lê ev parastin û pêşxistina zimanê fermî divê nebe sedema astengkirina zimanên din û yê kêmaran.⁵⁶ Bikaranîna zimanekî bi bikaranîna zimanên din ve divê zehmet nebe û astengîyan di xwe de nehewîne.

Bikaranîna baş

- Li Kanadayê, rêvebirên Québecê rêz li gel jîyana şexsî girtine û tiştên ku kes tercih kirine ji bo wan astengîyan dernexistine û zimanê wan azad hiştine lê di qadên giştî de bi şerta ku ew jî zimanên netewî zêdetir nebe danîne. Ev jî dide nîşan ku dewlet dikare hem zimanê kêmaran bide nişandan hem jî hînbûn û bikaranîna zimanê netewî teiwîq bike.
- Li ABDê di qadên xebatê de ji bo derfeta bikaranîna zimanê netewî û bikaranîna zimanê kêmaran li hev pareve hatiye kirin, bo hev astengî dernaxin û dema bikaranîna wan jî bi dîrektîfan hatiye kifşe kirin.⁵⁷

4.8. Bi Awayekî Çalak Tevlêbûna Zimanî ya Kêmaran û Tevlêbûna Jîyana Giştî

Divê çi bê kirin?

Ji bo ku kêmar bi awayekî çalak tev li jîyana giştî bibin û jîyana giştî ji bo wan hêsantir be – rewşên ku guncav bin – di pêvajoyên hilbijartin an jî tevlêbûna giştî de divê bi zimanên xwe tev bigerin. Herêmen ku kêmar lê zêde dibin li wan cihan divê; agahîyên bijareyan, belgeyên ku ji bo raya giştî vekirîne û pusulayên hilbijartinê yan jî îstatîstîkên raya giştî bi zimanê wan ve divê bê parvekirin û her kes bikaribe xwe bigihîne van dokumentan.

⁵⁴ Ulusoy and others v. Turkey, European Court of Human Rights, 34797/03, 3 May 2007

⁵⁵ Şükran Aydın and Others v. Turkey, European Court of Human Rights, 49197/06, 22 January 2013

⁵⁶ Ballantyne, Davidson, McIntyre v. Canada (note 8).

⁵⁷ US Guidelines on Discrimination because of National Origin, <www.ecfr.gov/cgi-bin/text-idx?SID=c23c33ef4cf089f-166b9e143789066bc&node=29:4.1.4.1.7&rgn=div5#29:4.1.4.1.7.0.21.7>..

Divê ji bo çalakîyên partîyên sîyasî, sazîyên sîvîl, komên lobîyan û ji bo kesên serbixwe di civînan de ji bo poster û belgeyên xwe derfeta bikaranîna zimanê kêmaran bê dayîn.

Divê çima bê kirin?

Ji bo ku tevlêbûna jîyana civakî û sîyasî ya kêmaran zêdetir be, cihên ji alîyê nifûsê ve guncav bin, divê bi zimanê kêmaran ve tehlêbûnê pêk bînin. Di nav encamên erênî de em dikarin bejin ku; kêmar zêdetir tev li polîtîkayê bûn, rey zêdetir bûn, tevlêbûna sîyaseta mahallî zêde bû û yekbûna bi dewletê re jî zêdetir bû. Li dor çarçoveya hêmana rêjeyê bikaranîna zimanê kêmaran ji bo yekbûna raya giştî gelek bibandor e. Di rewşeke dijber de jî, wek ku di hilbijartinan de, li partîyên sîyasî, li sazîyên sîvîl û ji alîyê kean ve bikaranîna zimanê kêmaran bê qedexekirin ev jî dibe sedema hestên vederkirinê û beyanîbûnê.

Pratika ku bingeha xwe ji kîjan zagonan digre û zarûriyetên wê

- Madde 25, 26, Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê Mafên Sîyasî û Medenî de (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 5, Peymannameya Navnetewî ya di Derbarê ji bo Cihêkariya bi her Awayî ji Holê bê Rakirin (Neteweyên Yekbûyî).
- Madde 14 + Bent. 3, Protokol 11, Peymannameya Avrupa ya Mafên Mirovan (Konseya Avrupa).
- Madde 4 & 10, Peymannameya Çarçove ji bo Parastina Kêmarên Netewî (Konseya Avrupa).
- Madde 10, Şerta Zimanên Kêmare yê Herêma Avrupa (Konseya Avrupa)
- Madde 2(2) & (3), Danezana di Derbarê Mafên Kêmarên ku di Nav Komên Netewî yan jî Etnîk, Dînî yan jî Zimanî de ne (Neteweyên Yekbûyî).
- Şêwr. 11 & 15, Nîşeya Sekreterya NY di Derbarê Cihêkariya Netewî û Parastina Mafên Kêmaran de (2013).
- Şêwr 11 & 15, Şêwra Sekreterya NY di Derbarê Cihêkirina Netewî û Parastina Mafên Kêmaran de (2013).
- Şêwr 13, Şêwra Osloyê ku di Derbarê Mafên Zimanên Kêmaran de (OSCE).
- Şêwra Lundê ku di Derbarê Tevlêbûna Jiyana Civakî ya Netewên Kêmaran de (OSCE).

Divê çawa bê kirin?

Cihên ku kêmar lê zêde dibin, divê li belgeyên hilbijartinan, îstatîktîkên raya giştî û biryarên ku di qadên raya giştî de divê mirov hilde û bi awayekî maqûl bi zimanên kêmaran ve jî bikarbîne.⁵⁸ Encama vê ya muhtemel; kes baştir ji tiştan agahdar dibin, tevlêbûn zêde dibe, kêmar zêdetir tev lê dibin û yekbûn pêk tê.

⁵⁸ Office for Democratic Institutions and Human Rights, *Guidelines to Assist National Minority Participation in the Electoral Process* (Organization for Security and Co-operation in Europe: Warsaw, 2001), <<http://www.osce.org/odihr/elections/17569?download=true>>, p. 16.

Divê rêvebirên dewletê heta asteke baş kampanyayên hîlbijartinan, bernameyên radyo û televîzyonan ji bo ku pêwajoyên din ên piştgirîyê hatine amade kirin van zimanan wek zimanê ragihadinê bikar bîne. Ev ê bibe sedema têkilîyeke xurttir di navbera kêmar û rêvebiran de, bi vî awayî kêmar yê zêdetir tev li jîyana raya giştî bibin.

Ji bo kampanyayên hîlbijartinan de, civînen ku gel tev lê dibin de, ji bo materyal û bikaranînen medyayê de zimanê kêmaran dibe destgihîştina sîyasetmedaran û rewşeke erênî temsîl dike.

Ji bo hîlbijartin û tev lê bûna sîyasî divê bikaranîna zimanê kêmaran neyê cihê kirin. Kes dema ji ber nezanîna yan jî baş nezanîna zimanê netewî heger ji bikaranîna reyan dûr bisekinin an jî nebin endam, encamên girîng ên neyînî derdikevin holê.

Ji ber şert û mercên zimanî redkirina hemwelatîbûnê dibe astengek ji bo jiyana civakî ya dewletekê. Ji bo qebûkirina hemwelatîyê, şerta zimanî yan jî piştî xwe bide sedemên nedîyar ev dibe cihêkarî.⁵⁹

Biakaranînen baş

- Li ABDê ji bo hîlbijartina federî, propakandayên hîlbijartinê bi zimanê kêmaran be nîfûsa kêmaran an %5 be yan jî tevahîya nîfûsa wan 10.000 be danasîna hîlbijartinê bi zimanê wan jî pêk te. Alîkarîya devkî, agahdarîyên li ser reydayînê jî di nav de ne. Ji bo ku astengîyên bikaranîna rey bê rakirin û ji bo ku tevêbûna jiyana civakî bê teşwîq kirin, li ABDê materyalên propakandayan 12 zimanî tên amade kirin. Ji bilî vê qeydên dengdêran bi Çînî, Japonî, Koreyî, Spanyolî, Tagalogî û Vîetnamî tê kirin.
- Li Hindîstanê pîrfîkrî û pîrzimanî encam daye ku sendika, zagonên eyaletan û rêvebirî jî bibin pîrzimanî. Di tevahîya welat de ji 30î zêdetir ziman tene bikar anîn.
- Li Hirvatîstanê dengdêrên ku ji kêmaran in ji bo listeyekê netewî yan jî ji bo listeyeke kêmaran dikarin deng bidin. Komên biçûktir wek; Macar, Sîrp û Îtalî mafê wan bi yek wekîlek heye lê kêmarên hindiktir di nav xwe de dibin kom û ji bo wan jî wekîlek tê hîlbijartin.
- Li New Zelandê agahîyên dengdêran zimanê şanîdanê jî dit ê de bi 26 zimanan ve tê peşkeş kirin.
- Cumhuriyeta kevin a Yugoslav – Makedonya derfet ji bo kêmara Romenan, zêdetir li herêma Shuto Orizariyê kom bûne, li ser hîlbijartinê temsîlîyeta herêmek taybet pejirandine û kom ji nav xwe wekîl dikarin hîlbijêrin.
- Li Qralîyeta Yekbûyî, ji xeynî Îngîlîzî, Skoçî yan jî Galî ji bo şerta zimanî ya hemwelatîyê şerta hebûna zimanê temam dike. Li Kanadayê, ji xeynî Îngîlîzî Fransî jî divê bê xwestin.
- Li Swîsrê ji bo hemwelatîyê Amani, Fransî Îtalyanî yan jî Romenî bi awayekî baş hebe têrê dike.
- Li Norwêçê agahîyên dengdêran zimanê Samî jî di nav de bi 8 zimanan ve tê dayîn. Ji bo hîlbijartinên Parlementoya Niştecih ya Samîyan jî kartên reyan hene.

⁵⁹ Costa Rican Naturalisation Case (note 17).

- Li Bolîvya, Etîyopya, Fînlandîya, Paraguay, Rusya, Sîngapu, Slovenya, Başûrê Afrîka û gelek welatên din, di zimanê kêmaran de materyalên hilbijartinê amade kirine û agahîyan bi gelek zimnan ve didin.

Pêvek 1

Çavkanî û alavên zêdetir: Dîrektîfên zagonî û belgeyên fermî yên têkildar

1. UN Declaration on the Rights of Persons Belonging to National or Ethnic, Religious and Linguistic Minorities (UN), <http://www.ohchr.org/EN/ProfessionalInterest/Pages/Minorities.aspx>
2. Report of the Independent Expert on minority issues on linguistic minorities, A/HRC/22/49, http://www.ohchr.org/Documents/HRBodies/HRCouncil/RegularSession/Session22/AHRC2249_English.PDF
3. Other reports of the mandate of the Special Rapporteur on minority issues, <http://www.ohchr.org/EN/Issues/Minorities/SRMinorities/Pages/Annual.aspx>
4. Recommendations of the UN Forum on Minority Issues on Implementing the Declaration on the Rights of Persons Belonging to National or Ethnic, Religious and Linguistic Minorities (UN), <http://www.ohchr.org/EN/HRBodies/HRC/Minority/Pages/ForumIndex.aspx>
5. Promoting and Protecting Minority Rights: A Guide for Advocates (UN), http://www.ohchr.org/Documents/Publications/HR-PUB-12-07_en.pdf
6. Minority Rights: International Standards and Guidance for Implementation (UN), http://www.ohchr.org/Documents/Publications/MinorityRights_en.pdf
7. Marginalized Minorities in Development Programming: A UNDP Resource Guide and Toolkit (UNDP), <http://www.ohchr.org/Documents/Issues/Minorities/UNDPMarginalisedMinorities.pdf>
8. Advocacy Kit for Promoting Multilingual Education: Including the Excluded (UNESCO), <http://unesdoc.unesco.org/images/0015/001521/152198e.pdf>
9. Guidelines on Language and Education (UNESCO), <http://unesdoc.unesco.org/images/0012/001297/129728e.pdf>
10. Why language matters for the Millennium Development Goals (UNESCO), <http://unesdoc.unesco.org/images/0021/002152/215296E.pdf>
11. Thematic Commentary no. 3 on the Language Rights of Persons Belonging to National Minorities under the Framework Convention (Council of Europe), http://www.coe.int/t/dghl/monitoring/minorities/3_fcnmdocs/PDF_CommentaryLanguage_en.pdf
12. Oslo Recommendations regarding the Linguistic Rights of National Minorities (OSCE), <http://www.osce.org/hcnm/67531>
13. The Hague Recommendations Regarding the Educational Rights of National Minorities (OSCE), <http://www.osce.org/fr/hcnm/32184>
14. Guidelines on the use of Minority Languages in the Broadcast Media (OSCE), <http://www.osce.org/hcnm/32310?download=true>
15. Guidelines to Assist National Minority Participation in the Electoral Process (OSCE), <http://www.osce.org/odihr/elections/17569?download=true>

Çavkaniyên din

Baldwin, C., Chapman, C. and Gray, Z., *Minority Rights: The Key to Conflict Prevention* (Minority Rights Group International: London, 2007) <http://www.minorityrights.org/download.php?id=174>

Benson, C., *Mother Tongue-based Teaching and Education for Girls* (UNESCO: Bangkok, 2005), <http://unesdoc.unesco.org/images/0014/001420/142079e.pdf>

de Varennes, F., *Language, Rights and Power: The Role of Language in the Inclusion and Exclusion of Indigenous Peoples*, UN Expert Mechanism on the Rights of Indigenous Peoples (OHCHR: Geneva, 2011). <http://www.ohchr.org/Documents/Issues/Indigenous/EMRIP/StudyLanguages/FernandDeVarennes.doc>

Ouane, A. and Glanz, C. (eds). *Optimising Learning, Education and Publishing in Africa: The Language Factor* (UNESCO Institute for Lifelong Learning / Association for the Development of Education in Africa: Hamburg/Tunis, 2011)

UNESCO, *Improving the Quality of Mother Tongue-based Literacy and Learning: Case Studies*

from Asia, Africa and South America (UNESCO Asia and Pacific Regional Bureau for Education: Bangkok, 2008)

UNESCO, Institute for Lifelong Learning, *Why and How Africa Should Invest in African Languages and Multilingual Education: An Evidence- and Practice-based Policy Advocacy Brief* (UNESCO: Hamburg, 2010), <http://unesdoc.unesco.org/images/0018/001886/188642e.pdf>

UNICEF and Vietnamese Ministry of Education and Training, *Action Research on Mother Tonguebased Bilingual Education: Improving the equity and quality of education for ethnic minority children in Viet Nam*, September 2012, http://www.un.org.vn/en/publications/publications-by-agency/doc_download/312-action-research-on-mother-tongue-based-bilingual-education-improving-theequity-and-quality-of-education-for-ethnic-minority-children-in-viet-nam.html

World Bank, Education Notes, *In their own Language: Education for All* (World Bank: Washington, DC, 2005), http://siteresources.worldbank.org/EDUCATION/Resources/Education-Notes/EdNotes_Lang_of_Instruct.pdf